



# Armanc

Danerê rojnameya pêşî ya Kûrdî  
Miqdad Mithed Bedirxan

Hejmar, No: 8

Adar-March 1996

Buha-Price: 40 000 TL

20 SKR

4 DM

## Şowa Şemo


**H**ukûmet carekê bi xwe ne samîmî yê berfirehkiri na demokrasiyê û maf û azadîyên însanan e. Demokratên rastin di nava partiyên şirikên hukûmete de nînin, hema hema tevayiya wan, muhafezekar û nasyonalistên şovenîst in, terefdarê militarizmê ne, ji nuhbûnê ditîrsin, kevnoperest in. Hinêñ din jî menfeetperest û keysperest in; li pey berjewendiyêne xwe yên rojane ne. Di van du meh û nîvîn dawiyê de wan çivênu Mesûd Yilmazî û Çillerê ji bo berjewendiyêne xwe yên şexsî dan hev, eşkere didin diyarkirin ku ev hukûmet ne ji bo icraat û karkirinê, lê ji bo parvekirinê ava bû.

rûpel 3

## Korucî ji dêrê û mizgeftê bûn

**W**er xwiya ye dewlet di şerê li dijî PKK'ê de gihaşt armanca xwe. Gund û gundiyêne Kurdistanê ku piraniya wan li ser sînorê Iraqê bûn, êdî nemabûn; gund wêran bûbûn, gundî jî ji gundên xwe hatibûn derxistin. Dewlet di sala 1987'an de sistem "Parêzeren Gundan" danîbû û heta nuha li tevayiyê Kurdistanê 55 hezar korucî top kiribûn. Herçiqas dewlet di van mehîn dawiyê de hinek çekêne parêzeren gundan ji wan digre jî hîn dixwaze ev sistem berde-wam-be.

rûpel 5



Newroza we pîroz be !



## Hukûmet ava bû, ji Kurdan re "Nothing"

Neviyê Bedirxaniyan Prof. Emre Gunensay  
bû Wezîrê Derve yê koalîsyona DYP û ANAP'ê

**B**i avakirina koalîsyona DYP û ANAP'ê dewletê krîza xwe ya hukûmetê nuha çareser kir le krîza siyasi dê çawa çareser bibe hîn ne diyar e?

Hukûmet 53'an a koalîsyonê ku di navbera DYP'a Tansû Çillerê û ANAP'a Mesûd Yilmaz de çêbû hukûmeteke wilo ye ku cara pêşîn li Tirkîyê tê ceribandin û li dînyayê jî nimûneyên wê kêm in. Di 5 salêñ hukûmetê de sala pêşîn Mesûd Yilmaz, salêñ dudu û sêyan Tansû Çiller, sala 4'an dîsa Mesûd Yilmaz ê serokwezîriyê/a hukûmete bikin. Sala 5'an jî ji derveyî van herdû serokênen partiyen parlamenterekî ji Partiya Çillerê

DYP'ê bibe serokwezîr.

Wexta serokekî/e partiyê bibe serokwezîr seroka/e partiya din di wê hukûmetê de ci nagire û bi vî hawî cara pêşîn modelek nû ya hukûmetê di siyaseta Tirkîyê de tê holê.

Herçiqas van herdû partiyen baskê rast yên Tirkîyê hukûmet ava kirin jî di programa wan a hukûmetê de tiştekî berbiçav ji bo pirsa Kurdi tuneye. Li gorî gotina wan ew ê hîn bi hiskayî li hemberî terorê bisekinin. Dê di demeke nêzîk de "Rewşa Fewqelade" li herêmên Kurdistanê rakin; lê di şuna wê de dê selehiyetan eskeran zêdetir bikin, yanî pirsa Kurdi bi tevayî bispêrin leşker û generalan.

# Name Anons

# İlan

## Hevalên redaksiyona Armancê

Destê we sax, qelama we tûj be. Bi rastî we bi derxistina Armancê valayiyek tije kir. Me digot qey li Welat tenê "Welatê me" derdikeve. Lê pişti ku min Armanc dît û zanî ku ew, ev 15 sal in jiyana xwe ya weşanî li Swêdê didomîne û ev nêzî 8 meh in jî li Stenbolê derdikeve gelek kêfa min hat û ewrênu ku hatibû ber çavên min û di nav toz û dûmanê de min li bûyeran dinihêri wenda bûn. Edî bi saya Armancê hîn objektîv ez ê li bûyarên ku bi-qewimin, binêrim. Armanc objektîv li bûyaran mîze dike, wan tahlîl dike û tîne berçavêن xwendevanan.

Belkî iro xwendevanê wê yên Kurdi kêm bin lê Armanc di nava weşanî Kurdi de ku heta nuha derdikevin ciyekî sereke digre.

Ez xwendevanelekî Kurd im û heta nuha ji ber tirs û xofen ku li ser me û li ser însanên me hene em nikarin zêde dengê xwe derxin.

Ez kurê meleyekî Kurdistanê me û xwendin û nivîsandina Kurdi ji bavê xwe fêr bûme. Lê ji ber ku ez nuha ji li Kurdistanê dijim ez nikarim navê xwe yê rast ji we re binivîsim.

Lê ez xwendevanelekî we yê dilsoz û tiryakiyê rojnameya we me.


Bîmîn di xweşiyê de.

M. Sarûm -Diyarbekir

# ĐUGIR

Hejmara 3'em derket  
Bibe abone, aboneyan jê re peyda bike

Adresa xwestinê  
Dugir  
Box 3437  
165 23 Hässelby-Sweden  
Tel-Fax: (0)8-383934



E. Kemal Adsiz  
(1957- 20-03-1986)

Di 10 saliya şehîdbûna  
hevalê me, Eyub Kemal  
Adsiz de em wî bi giramî  
bi bîr tînin

YEKBUN  
Rêxistina Ewrûpayê

## Hemû hejmarên Armancê hatin cildkirin

Cild 1- hejmarên 62-92  
Cild 2- hejmarên 93-128  
Cild 3- hejmarên 129-158

Her sê cildên wê 750 SKR ne.  
Kesên ku bi posteyê bixwazin divê heqê postayê jî  
bidin.

Adres:  
Box: 152 16  
161 15 Bromma-Sweden  
Tel: 08-803135  
Fax: 08-801825

## Li ser hilbijartina Tirkîyeyê

Di rojnameya Aramancê hej. 6'an de li ser hilbijartina payiza 95'an bi dûrûdirêji tê rawestandin. Tê gotin ku "Di vê hilbijartinê de HADEP bi ser ket" û di vê dewleta Tirk edî hesabê Kurdish bike, doza Kurdish bi aweyekî siyâsî hal bike. Tişten ku di vê babetê de tên gotin bi giştî rast û durist xuyan bikin ji bi a min rastiya meselê û çareserkirina doza Kurd li Tirkîyeyê nadîn xuyakirin.

Ronakbirê gelê Kurd yên ku dixwazin li çareya doza Kurd bigerin û vê birînê bixwazin helbikin divê hindekî din li serxwebûna fikra xwe û dîtinê xwe xwedî derkevin û ji çerçewaya fikr û rîbazân "partî" yên xwe derkevin û bêhtir bi aweyekî objektîv binividînin da ku ev gelê ku bi salan hetiye xapandin edî hew were xapan-din.

Dî derheqê vê hilbijartinê de piraniya dîtinê di vê hejmarê de hatine nivisîn di vê baweriyê dene ku partiya HADEP bi ser ketiye. Lê heger ji hinek kesen din yan jî partiyen dinbihata pirsîn dê hinek fikrîn din jî bihata meydanê. Piralibûn û azadiya fikra serbixwe û xuyakirina wê bi kêmâyî di kovareke Kurdi de bi a min geleke girîng e.

Ez bi xwe ne di wê baweriyê de me ku HADEP di hilbijartinê de bi ser ketiye bilekis mîletê Kurd li Tirkîyê da xuyakirin ku ew naxwazin doza xwe bi rîça HADEP'ê çareser bikin. Ji %17 dengê xwe dane HADEP'ê lê ji %83 jî dengê xwe dane partiyen din yên Tirkîyeyê. Ji bo ci em xwe dixapîn? Parlamenteñ ku bi riya partiyen Tirk çûne parlamentoya Tirkîyeyê jî bi piraniya xwe Kurd in û gelê kurd dengê xwe daye wan.

Heger em bixwazin bahsa HADEP'ê bikin divê em bêjin ku vê partiyê herçiqas li Kurdistanê % 17 deng stendin jî hîn ew ji riya biserketinê gelek dûr e. Heger HADEP xwe ji girêdana PKK'ê bikaribûna dûr bixista-ya û bi serê xwe hereket bikira dê bêtir deng bistenda. Şaşitiya ku HADEP'ê hîn di destpêka avakirina xwe de kir hîn jî ev şaşîti berdewam e û ev jî bû sebeb ku ji %83 gelê Kurdistanê dengê xwe dan partiyen din yên Tîrkan. Divê mirov jîbîr neke ku HADEP jî di vê deng-danê de ne bi tenê bû, komek hêzên din jî pê re tifaq çê-kiribûn.

Bareş Battê-Uppsala

Armanc  
Rojnameya Kurdi ya Mehane  
Aylık Kürtçe Gazete

Li ser navê Weşanxaneya  
Çarçirayê Xwedî û berpirsiyar  
(Çarçira Basın ve Yayıncılık Ltd. Sti.  
adına Sahibi ve Yazışları Müdürü)

Nesih Çilgin

Redaktorê Berpirsiyar:  
Mûrad Ciwan

Redaksiyon:  
Mumtaz Aydin  
Faris Can  
Nihat Elî  
Ehmed Huseynî  
Yaküp Karademir  
Remzî Kerim  
Mahmûd Lewendi  
Hesen Mizgîn  
Emîn Narozi

Berpirsiyarê besê Dimili:  
Malmîsanij

Şertîn Abonetiyê  
Abonetiya Salekê

Tirkîyê: 400.000 TL  
Skandînaviya: 250 SKR  
Ewrûpa: 60 DM  
Derveyî Ewrûpayê: 50 \$

Anons / İlan  
Nîv-rûpel  
5.000 000 TL  
2500 SKR  
500 DM

Hesab No:  
0017880 - 6 / BU6 / 01  
Yaküp Karademir  
Akbank T.A.Ş  
142 Aksaray-Ist.

Adres:  
Guraba Huseyinâ Mah.  
Dagarcık Sok. Mehmet Han No:  
327B, D:23  
Aksaray-Istanbul Türkiye

Tel-Faks: 212-6312515

Adresa Ewrûpayê:  
Box: 152 16  
161 15 Bromma  
Sweden

Tel: +46 8-803135  
Faks: +46 8-801825  
Hesabê Ewrûpayê:  
Postgiro: 4972255-6  
Sweden

Ji bo aboneyen Almanyayê  
M. Ali Karaaslan  
Dresdner Bank-Giessen  
Konto: 8 838 847 00  
BLZ: 513 800 40

## Ji Jîna Nû kitêbeke nû

Ordixanê Celîl & Celîlê Celîl

## ZARGOTINA KURDAN -I-



Adresa Xwestinê  
Jîna Nû  
Box: 152 16  
161 15 Bromma-Sweden

# Rojev

Adar-1996

**A**deta hirçreqisandinê hema hemâ ji bal me hemûyan ve tê zanîn. Tê bîra min, gava em biçük-bûn, carna hin gerrok dihatin gund an qeseban, hirçekê difmbizincir li pey wan dilikumî serê zincîra hirçê di bin çengê wan de, erbane di destê wan de... Dihatin li meydana gund an a mehelê li erbanê didan û hirç direqisandin pê re jî distiran;

"Yarali Şemo yarali.

Diya Şemo şivan e

Bavê Şemo gavan e..."

Hirç li ber erbane û sitranê radibûn ser piyên paşîn û direqisi.

Ji bo me zarokên gund an ên qesebê ev "şowa hirçreqsandinê" tiştekî gellekî balkêş û dilxwes bû, em bi vê şowê re, ji kîfan ji xwe ve diçûn, pê şad dibûn. Pişti şowê ji xwediyê hirçê diket nav me, qismetê xwe yê wê rojê berhev dikir û berê xwe dida meydana gundekî an meheleke din.

Piştî ku em mezin bûn, me xwend û fehm kir ku ew hirç ne ji kîfa dilê xwe re, ne ji ber kîfxweşîya erbanê an sitrana xwediyê xwe re radibe direqise. Ew berê bi salan li ser sèlekê hatiye rawestandin ji aliyeke dengê erbane û sitrana pê hatiye guhdarîkirin. Ji aliye din ve ji di eyñ wextê de hêdî hêdî agirek li bin sêla hesinîn hatiye dadan û sêl hatiye germkirin. Ku sêl dest bi germbûnê kiriye hirçê ji destpê kiriye lingek hilaniye û yek daniye. Hergav ev seansa dualî bi hirçê hatiye tekrarkirin. Ü rojekê welê li hirçê hatiye ku, bêyî ku sêl di bin lingê wê de hebe, gava dengê erbanê û vê sitranê hatiye hirçê gotiye qey wê sêl ji germ bibe û hetta germbûneca xeyali hîs kiriye û dest pêkiriye lingek hilaniye û yek daniye. Tu nebê gava me temâşevanê lidora hirçê digot qey ew ji kîfan re direqise û em ji pê re diketin coşê, hirça reben ji ber "ezabê sêla sincir?" piyek radikir û yek dadanî. Me ji hirçê re digot; "Şemo".

Gava hukûmeta iro ya Tirkîye hat avakirin "Şowa Şemo" hat bîra min. Pişti xirecir û helahelayek du meh û nîvan, axir hukûmeteke ji şîrîkatîya partiya Tansû Çiller xanîmê û ya Mesûd Yilmaz Efendiyî hat avakirin.

Hin kes û der û dor, xwiyaye ji avabûna hukûmete bi şîrîkatîya ANAP û DYP'ê gellek kîfxwes in bi pîrozbahû û şovêne mezin vê buyerê pîroz dikin, dix-

# Şowa Şemo

wazin û muhawele dikin ku tevayıya mirovê li Tirkîye jî pê bidin bawerîkirin ku ev gaveka mezin e ji bo hemû millet.

Hukûmet bi xwe jî bi pesinandineke mezin xwe derdixe pêşberî raya giştî. Li gorî berdevk û terefdarê hukûmetê ev hukûmet ne hukûmeteke parvekirinê lê ya karkirinê ye. Hukûmetek e ku wê icraatan û reforman bike û Tirkîye jî vê rewşa xerab derxe, welê bike ku Tirkîye ka ni pî-nû têkeve sala du hezaran. Ji bo ku hêviyek ber bi vê pesinandinê û raya giştî ya derva û hundurê welêt çêbibe jî hê ji destpêkê de hukûmet wekî "Şemoyê me yê reben" hin şowan pêşkêsi te-meşevanan dike:

**Nîvîskarê bi navûdeng** Yaşar Kemal her di wê rojê de ku hukûmet tê avakirin, ji alî mahkema ewlekariya dewletê ve bi salûnîvekekê tê cezakirin, serokwezîr Mesûd Yilmaz radibe li mescalîz użre xwe ji Yaşar Kemal dixwaze û rexne li parlamento û siyasiyan digre ku çawa dikarin qanûneke welê bihelin ku Yaşar Kemalî mehkûm dike. Dibêje ku divê qanûnek wiha ji alî vê parlamento û bê rakirin.

Li nîveka paytaxta Tirkîye Anquerê, cîma ku mameste muhaweleya girtina sendîka xwe ya ji aliye waliyê vî bajari ve protesto dikin, ji alî polisan ve tê kutan, di nava xwînê de tê gevizandin. Hema roja piştî wê, du wezîren hukûmete; wezîre karûbarê hundirîn û yê hindekariye gazi berpirsiyaren mamosan dikin li meqamên xwe, li ber kamereyen televizyonan użre xwe ji wan dixwazin û ahd dikin ku alîkârî û piştgiriya wan bikin.

Di televizyonan de derdikeve ku hin Kurdîn ji gundêne xwe barkirî, li Wanê û li Hakariyê ji bo ku bikarîn jiyana xwe bidominin, diçin li ser sergoyen bajaran li kuntêlîn nanî digerin, tînin dişon û dixwin. Hukûmet, hema sê parlamente û verêdeke van bajaran, da xwêdîgiravî tehçiqatê bike, rastiyê derxînîn meydanê ku hukûmet çareseriyeke bike.

"Şowen hukûmeta Şemo" bi vê yekê naqedin, programa hukûmete bi idayê mezin dagirtiye. Li gor programê wê reformen aborî, huqûqû û siyasi bêne kirin, dewlet bê piçûkkirin, demokrasî bê berfirehkirin, enflasyon bê daxistin, ji du milyon kesan re kar bêne dîtin, rewşa awerte li Kurdistanê were rakirin, rî li

ber gundiyê koçbarkirî bê vekirin ku vegerin ser warêne xwe, xaniyêne wan bêne avakirin, tedbirêne aborî, civakî û siyasi li herêmê bêne girtin. Wê ji yekîtiya gumrukê ber bi endambûna Yekîtiya Ewrûpa bê meşandin û wê bêne kirin û wê bêne kîrin...

Li ber çavêne raya giştî şowen ku têne kirin û teahudêne têne dayîn wekî reqla şemo xwes dixwiyen. Lî gava meriv bala xwe dide rastiya hukûmete, şiklê ava bûna wê, xusûsiyeten partiyen ku hukûmet avakirine û partiyen ku wê piştgiriye bidin vê hukûmete, eşkere xuya dibe ku her du lingê vê hukûmete jî wekî lingê şemo li ser sèleka sincinandîne.

**Hukûmet carekê bi xwe ne** Hdilxwazê samîmî yê berfirehkirina demokrasiyê û maf û azadiyê insanan e. Demokratîn rastîn di nava partiyen şîrîken hukûmete de nînin, hema hema tevayıya wan, muhafazekar û nasionalistîn şovenist in, terefdarê militârîzmîne, ji nuhbûnê ditirsin, kevneperest in. Hinê din jî menfeetperest û keysperest in; li pey berjewendiyen xwe yêne rojane ne. Di van du meh û nûnen dawiyê de wan cîven ku Mesûd Yilmazî û Çillerê ji bo berjewendiyen xwe yêne şexsî dan hev, eşkere didin diyarkirin ku ev hukûmet ne ji bo içraat û karkirinê, lî ji bo parvekirinê ava bû.

Ew hukûmet bi zorê ava bû, ne bi dinamîzma xwe, lî bi dahfdana quwetên derveyî wê hat lidarxistin.

Piştî eşkereye ku ev hukûmet bi xwe naxwaze, lî bixwaze jî nikare reforman çêke. Çimkî ew hukûmetaka hindikayîye ye. Ew muhtacî yekî wekî Ecewîte nasional-sosyalistî muhafazekar ê dewletperest e. Ka Ecewît dihêle ku reform pêkbîn pirsa Kurdî berbi çareseriye here û berê Tirkîye têkeve dinya Rojava, demokrasî û serbestiyê?

Loma jî bawerbikin ku ev hukûmet çiqas şowan dike, çiqas direqise bila bireqise, bêfede ye ew ne ji bo şayî û kîfxweşiyê vê dike. Di bin piyên wê de sèleka sincirî heye, agir her ku gurr dibe ja-na piyan dide dilan, ew loma direqise...

"Yarali Şemo yarali  
Şowa Şemo li dar e  
Fêl di bin de likar e"

Mûrad Ciwan

kûmete de ji Erkanî Herb rola xwe listiye û ji ber wê di deqîqeya dawiyê de ANAP'ê bi Partiya Refahî ya Necmettin Erbakan re şîrîktiye xwe xera kiriye.

**Neviyê Bedirxaniyan bû Wezîre Derve**

DYP'ê û ANAP'ê wezaratêne hukûmete di nav xwe de parve kirin. Wezîre Derve yê koalisyonê ji DYP'ê Prof. Emre Gunensay e. Emre Gunensay neviyê Bedirxaniyan e. Herçiqas heta nuha di raya giştî de Prof. Emre Gunensay wek Kurd xwe nedaye diyarkirin û Kurd pê nizanîn ji lê piştî vê wezîfeyê dê kunya wî ji eşkere bibe. □

## Ji Kurdan re "Nothing"

Cîvîna parlamente û ANAP'ê yê Kurdistanê

Berê ku hukûmet ava bibe parlamente û eslê wan Kurd in û bi ANAP'ê re ne bi hev re cîvînek li dar xistin. Di cîvîne de li ser pîrs û pirsgirekîn herêmê sekînîn û gotin ku; "Divê edî rewşa fewqelade rabe".

Lê ew ew pîrsa Kurdî wek pîrseke aborî dibînîn û di cîvîna xwe de gotin ku "Ger kar û kargeh li herêmê bête peyde-kirin dê tesîra cudaxwazan li herêmê kêm bibe û divê hukûmet li ser vê pîrsê

raweste".

Berî hilbijartînê bi taybetî partiya ANAP'ê û serokê wê Mesûd Yilmaz carna li ser pîrsa Kurdan disekinî û gotot; "wexta em bibin hukûmet em û vê pîrsê çareser bikin". Lî ew di eslê xwe de propaganda bidestxistina dengan bû: Çawa Çillerê digot; "em ê kevirekî ji nedîn wan; Mesûd Yilmaz ji li hember Çillerê digot; problema herêmê ne kevir e, inşan ne."

Lê ev herdû partî ji di eslê xwe de di bin emîr û fermanê Erkanî Herb de ne. Li gor hin bîr û rayan di avakirina vê hu-


## Nûçe

Kongreya Komeleya  
Nîvîskarêne Kurd

Stokholm Komelya Nîvîskarêne Kurd li Swêdê di 24'ê Sibatê de kongreya xwe ya yekem civand. Nêzî 30 nîvîskarêne Kurd beşdarê kongreyê bûn. Kongre xebata xwe ya salekî nirxand û li ser pirsgirêkîn nîvîskarêne Kurd rawestiya û hinek biryar girtin.

Komeleya Nîvîskarêne Kurd li Swêdê bi navê "Çira" sê mehan carekê kovareke kulturî derdixe.

Ji bo Komîteya Karker a Komeleyê Mehemmed Malmîsanij, Osman Aytar, Zinar Soran, Rohat Alakom, Salim Çeliker û Elişer hatin hilbijartîn. Komîte di cîvîna xwe ya yekem de M. Malmîsanij kir serokê Komelê û Rohat Alakom ji kir sekreter.



Refik Karakoç

Refik Karakoç  
"Em ê partiya Kurd  
û Tirkan ava bikin"

Stokholm Di 2'ê Adarê de Serokê berê yê Partiya Demokrasî û Guhartînê (DDP) Refik Karakoç hat li Stokholmê li ser hewldana avakirina partîyeke nû semînerek da. Di semînerê de nêzî 200 kesî beşdar bûn.

Karakoç li ser hewldana wan a avakirina partîke nû got ku; "Dê ev partî hîn çerçewa wê firehtir be û partiya Kurdish û kedkarêne Tirkan be, ji ber ku şerê ku li Kurdistanê li dar e zerara aborî didin kedkarêne Tirkan ji".

Piştî axaftina Refik Karakoç hin guhda û semînerê pîrs jê kirin û gotin ku; "Ev şela we ya ku hûn partiya Kurd û Tirkan bi hev re ava dikin şas e, divê edî Kurd bi navê xwe û bi kimlik xwe partîyan deynin".

Wek tê zanîn daweya DDP'ê di Mahkemaya Bingehîn de ye û serok û berpirsiyora û partîye di wê bawerîyê de ne ku dê ev partî bê girtin. Ji xwe ji bo vê yekê ye ku Serokê Partîye Refik Karakoç û hevalen wî yê din ji partîye istîfa kirin, da ku partîyeke din ava bikin.

Serokê yekem yê partîye İbrahim Aksoy ji ber axaftin û nîvîsene xwe hîn di hefsê de ye.

Berî semînerê di 1'ê Adarê de Refik Karakoç buroya me ya Stokholmê ji ziyaret kir û di derheqê hewladana avakirina partîye de agahdarî da endamên redaksiyona me".

# Raman

# Ferqa ku divê di navbera me û deweletê de hebe

Rojda Çelikel

**"Dema em wan ìnsanên ku wekî me nafikirin, xayîn ïlan bikin, biku-jin an iškence bikin, wê demê em nikarin li dijî iškencan, "cînayetên qisasnediyar" ûwd. derkevin û wan welatparêzên Kurd ku dewlet dibêje "terorist" in û dikûje, biparêzin. Ku em biparêzin jî, tu kesê me cîddî qebûl neke! Dema em bibêjin "xayîn e", "cahş e" û gun-dan bişewitînin, wê demê dema dewlet dibê "gundê terorîstan e" û xira dike û dişewitîne, em nikarin li dijî dewletê derkevin. Ku em derkevin jî tu kes baweriye bi cidiyeta me neyne!"**

Ji ber sedema ku herkes nikare di her babetê de hemfikir be, divê iſadekirina ramanan bi awayekî wiha bê garantîkirin ku azad be û di bin tehdidekê de nemîne. Însanan ev pirsgirêk xwestine bi sistemek wiha çareser bikin ku ji aliyê herkesi bê qebûlkin lê ji aliyê hêz û însanan ve tê tetbiqirin û navê wê "demokrasi" ye. Loma jî ne mumkun e mirov bêje ku her kes di baweriya demokrasiye de samîmî ye.

Demokratbûyîn, tevî ku mirov ne pêra be jî, hurmetlégirtin û tehemmulkirina raman û iſadekirina ramanen însanen dî ye. Ji ber ku di tekiliyên bi din-yaya derive de em nikarin tu kesi bixapîn, divê em bi rastî demokrat bin û bi kiranen xwe hurmete ji bo mafen mirovan nîsan bidin. Di qada neteweyî de jî demokrasi û mafen mirovan girîng e; mirov tenê ji bo xwe şîrîn nîsan de na-be demokrat; divê demokrasi bibe şîklê jiyana me. Divê em ji ber ku demokrasiye layiqê gelê xwe dibîn bibin demokrat û ji bo menfaata însanen civata xwe hurmeta mafen mirovan bigrin.

## Ma Tirk demokrat in?

Dewleta Tirk, gelek caran xwe wek parêzgerê demokrasî û mafen mirovan pêşkêş dike. Tirkîye, bi taybeti li wela-tên wek Bosna, Bûlgarîstan, Yûnânistan, Çeçenîstan û Qibrîse sloganen demokrasi û mafen mirovan dide pêş. Lê ji ber ku politikaya durê ya dewleta Tirk ji aliyê herkesi ve tê zanîn, tu kes van kiranen Tirkîye cîddî qebûl neke. Sebeb gelek besît e; ji bo mirov bikari-be demokrasiye û mafen mirovan biparêze, divê mirov bawerî bi wan anî be. Dewleta ku li Kurdistanê sîyasetek jenosidî dimeşîne, her pirsgirêkê dixwaze bi mantikeke eskerî û polisî "ça-reser" bike, parastina mafê jiyane ya ferdi ihlal dike û ji mafen demokratik û neteweyî bêpar dihêle, ku dema idia parastina demokrasî û mafen mirovan bike ne mumkun e mirov jê bawer bi-ke.

Meqamên Tirk heta ji wan tê bila bêjin ew demokrat in, tu kes ji wan ba-wer nake. Ji ber ku demokrasî kulturek e! Dema mirov dîroka Tirkîye ya siyasî bide ber çavan, sebeb tunebûna demokrasiye li Tirkîye dê bas were fahmkirin; li Tirkîye hertim direkt yan iñdirekt gotina leşkeran derbas bû-ye û şiddetê şekil daye jiyana siyasi. Ev e sebeb ku kultura demokrasiye li Tirkîye reh bernedane.

Herkes dizane ku li Tirkîye tu demokrasî û hurmeta mafen mirovan tu-ne ye. Baş e, gelo em Kurd di ci rewşê de ne? Ma em demokrat in? Em çiqas hurmet li mafen mirovan digrin? Dema ku em behsa siyaseta dewleta Tirk dikan ya ku şiddet, asîmîlasyon, jenosid û iškenceye esas digre û bi tu awayî ne demokratik e, gelo ji ber prensib'an em li dijî wan siyasetan derdikevin an ji ber ku em zirarê jê dibîn? Gelo me ji xwe û ji xelkê re işpat kiriye ku em di şûna dewleta Tirk de bûna em ê jê çêtir bûna?

Hin ji me, dema ku li dijî kiranen anti-demokratik ên dewleta Tirk derdikevin, bi dîtin û praktika xwe, wan kiranen ku em li dijî derdikevin, bi "versi-yona Kurdi" dikan jiyane. Ev babet, ji ber rewşa terorizebuyî û anti-demokratik bi awayekî bisihhet ji aliyê rewşen-bîran û raya giştî nayê munaşekirin.

## Kurd kultura demokrasiye nejiyane

Kurd, hem ji ber ku paş ve mane û hem ji xwedîyê mîjûyeke leşkerî ne, kultura demokrasiye nejiyane. Tekoşîna rizgariya Kurdistanê ku di qada navneteweyî de zehmetiyan dikşîne û rastî hezaran nakokiyân tê, di derheqê demokrasiye de divê ji herkesi zêdetir samîmî be û baweriye bide dora xwe. Zirara ku metodên anti-demokratik ku heta iro hatine bikaranîn, dane tevgera Kurdi ji aliyê herkesi ve tê zanîn.

Ji bo ku em bikaribin politikaya dewleta Tirk ya şîddetê li dijî Kurdan ji bo raya giştî ya dînyayê bidin fahmkirin, beriya her tiştî divê em li dijî man-tiqa dewletê bin û vêya ji di kiranen xwe de diyar bikin. Ev ji tenê bi wêjeyekê mumkun e ku em ji dewletê zêdetir demokrat bin û hurmeta mafen birovan bigrin. Dema em ne demokrat bin, em nikarbin xwedî li demokrasiye derkevin, tu kes me cîddî negre!

Dema em tehemmulâ dîtinên însanen li hember xwe nekin û rê nedîn ku ew hewl bidin ku dîtinên xwe têxin jiyane, em nikarin li hember kiranen dewleta Tirk yên li dijî ramanan derkevin û wan girtiyen li zindanan biparêzin.

Dema em wan însanen ku wekî me nafikirin, xayîn ïlan bikin, biku-jin an iškence bikin, wê demê em nikarin li dijî iškence, "cînayetên qisas nediyar"

ûwd. derkevin û wan welatparêzên Kurd ku dewlet dibêje "terorist" in û dikûje, biparêzin. Ku em biparêzin jî, dê tu kes me cîddî negre!

Dema em bibêjin "xayîn e", "cahş e" û gündan bişewitînin, wê demê dema dewlet dibê "gundê terorîstan e" û xiradike û dişewitîne, em nikarin li dijî dewletê derkevin. Ku em derkevin jî tu kes me cîddî negre!

Dema em rabin rojnamevanan tehdît bikin û êrişê wan bikin, wê demê em nikarin li dijî polisê Tirk, yê ku li rojnamevanan dixin, dikûjin û bînayên rojnameyan bombe dikan, rawestin. Ku em rawestin jî, dê tu kes me cîddî negre!

Herweha ev buyerê ku van rojan diqewimin jî, ji ber ku dişibin kiranen dewleta Tirk, gelek balkêş in: Wextek berê, dema ku ordiya Tirk Kurdistanâ Başûr işgal kiribû, hem ji bo peydekirina imkanen aborî û hem jî ji bo geşkirina hîssen şoveni û mobilizekirina Tirkêni şoven li dijî Kurdan, ew qampanaya ku di bin navê "bi Mehmetçik re dest bi dest" û bi reya "Komeleya Rojnamevanen Tirkîye" vekiribû, hem neteweyî, hem jî navneteweyî gelek rexne girt. Kurdan jî gelek caran idafe kirin ku ev qampanya ji bo qirkirina gelê Kurd e û dema rîvebirina vê qampanyayê li welaten Avrûpî li dijî qanûnen wan welaten û yên navneteweyî ye.

Iro ji dema Kurd rabin bi navê "Tevgera Welatê Rojê" şerek Kurdujî dest-pê kin û ji bo finansekirina vî şerî û mobilizekirina sempatîzanen xwe bi navê "Em Tevgera Rojê silav dikan" ilanen qampanyayê bidin rojnameyan û qampanyayan vekin, wê demê ma ferq di navbera me û dewleta Tirk de dimîne?

## Ferqa me û dewleta Tirk

Dîvem ji nuha de demokrasî û mafen mirovan ji xwe re bikin weke kulturê. Di van rojê ku bi carekê ve "kongreya neteweyî" ketiye rojeva hin însanan, mirov dibîne ku demokratbûyîne herî biçûk ji li holê tuneye. Lazim e mirov fahm bike ku bi tu tehdît û santajen weki "ya kongreya neteweyî yan ji emê hemû Kurdistanê bikin Hellepçe", "kongreya neteweyî" yan ji tu yekîtiyek ava nabe. Pêvajoya yekîtiya Kurdan bi demokrasi û hurmeta ji ma-fen mirovan ve girêdayiye.

Van rojê ku dewleta Tirk ji ber tunebûna demokrasî û mafen mirovan ji aliyê Ewrûpâyê ve tê mehkûmkirin, xwe-işpatkirina me Kurdan ji her demê pirtir girîngir e. Ku em bi her awayî alternatifbûyina xwe nedîn dîyarkirin, dê tu ferqek di navbera me û dewleta Tirk de tunebe. □

# Nûçe

## Ji Yaşar Kemal re 20 meh ceza

Nivîskarê Tirk ê (ku eslê wî Kurd e) bi nav û deng Yaşar Kemal ji ber nivîseka xwe ya ku di kitêba "Ji Ramanê re Azadi" de hatibû çapkîrin salek û 8 mehan ceza wergirt. Lî cezayê wî ji bo 5 salan hat tecîlkîrin. Li gor mahkemeyê sebabâ ceza gitina wî ew e ku wî "xelk teşwîqê kîn û dijminayetiye" kiriye.

Yaşar Kemalî li ser cezagirtina xwe got; "nabe weha ya ewê ceza bidin yan jî nedîn, ez ê mura-ceatî mahkemeya bilind bikim da ku cezayê min tesdiq bikin".

Berê jî ji bo nivîseka wî ku di kovara Almanî "Der Spiegel" de hatibû weşandin di derheqê Yaşar Kemal de mahkeme hatibû vekirin. Di vê nivîsa xwe de Yaşar Kemal li ser zulma dewleta Tirkîye sekînibû û ji bo çareserkirina Pirsa Kurdi rîyeke aşıyane parastibû.

## Ji bo kitêba Kurdi ceza

Xwedîye weşanxaneya Beybûnê İbrahim Kurekenî, ji bo weşandina kitêba Ekrem Cemîlpasayı ya bi navê "Muhtasar Hayatim-Kemalizme Karşı Kürt Aydin Tarihinden Bir Yaprak" (jiyana min, rûpelek ji têkoşîna rewşenbîren Kurd li dijî Kemalizmî), sal û nîvîkê cezayê hepsî girt. Kureken nuha di girtixaneya Haymanayê de girtî ye.

## Aliza Marcusê xelat wergirt


Rojnamevana Amerîkî Aliza Marcus, ku li Tirkîye nûcîgîhana Reuterê bû û ji ber nivîseke wê ya li ser Kurdan DGM ya Istenbolê ji bo wê ji du heta şes salan cezayê hepsî dixwest, xelata International press ya The National Press Club (NPC) a Washingtonê wergirt. Xanim Marcusê nivîsandibû ku leşkeren Tirk gundîn Kurdan dişewitîmin, loma jî di derheqê wê de mehkeme hatibû vekirin, lê bi zordayina hukûmeta DYB wê di pa-yiza 1995'an de beraat kiribû.

## Leşker li ser sînor dicîvin

Dewlet ji bo haziriya êrişike nû ya li dijî Kurdistana Başûr, leşkeren xwe li ser hûdûd dicivîne. Dewlet iddia dike ku hêzên PKK'ê ji nû ve vegeriyane ser bingeyen xwe yên li başûrê Kurdistanê. Loma jî careke din dixwaze têkeve nav axa Kurdistanâ Başûr. Wek tê zanîn ordiya Tirkîye ji 1983'an û vir de ev gelek caran e ku êrişê Kurdistana Başûr dike.

## Li Tirkîye iškence heye

Wezirê Dadmendîya Tirkîye Firuz Çilingîrogîl bixwe li xwe mikur hat û got: "Belê li Tirkîye hindik be jî iškence heye lê ev ne bi dî-rektîfa dewletê dibe. Hin polis hene ku di dilê wan de heskirina mirovan nîne, loma jî iškenceyê dîkin." Di van demen dawiyê de gelek işpat derketibûn ku li Tirkîye iškence dibe. Ji wan yek jî kuştina rojnamevan Metîn Göktepe bû.



**D**emokrasî û Kurd bi hev re gerek ne aşina ne. Hîn nuh nuh hev û din nas dikin. Ji ber vê yekê hinek ji me awa û prensibên demokrasiyê baş ji hev û din venagerînin, hinek ji me jî ji tunebûna tiradisyona demokrasiyê û zanîna wê feyde dibînin.

Gelê Kurd li Îranê ne ji rejîma pederşahî ya Îranê û ne jî ji şerîta molayan; li Iraqê li Suriyê ne ji diktatoriya Basîyan; li Tirkiyê ne ji "demokrasiya MGK" (Konseya Ewlekâri ya Netewîku di giraniya generalan da ye-) fêrî demokrasiyê bûye.

Demokrasî û demokratikbûyin teqabûlê civateke pêşketî û kultureke bilind dikin. Ji xwe civateke weke me ku hîn bi hin têkilî û dan û stendinê feodalî digere, ferdîn wê bi dîmekî wiha ve bi xurtî girêdayp ne ku bi idîa îdarekirina civate dertê û awa û prensibên 1300 sal berê hatiye danîn iro jî tatbiq dike, pêkanîna demokrasiyê û jiyanekî vekiî li vê civakê wê gelek wext bigre û wê ne hêsan be.

Em Kurdê li Ewrûpayê ku wextekî dirêj di nav idareya demokrasiyê de û civateke vekirî de dijin ji hemwelatiyê li welêt bi şanstir in. Bi taybetî ji Kurdê ku ji Kurdistanâ Başûr û Rojhilat têni bi şeklî be jî tu carî têkilî û pêwendiyê demokratik nejiyane. Wek mîsal, em li Ewrûpayê di nav komeleyan de rast lê têni, piraniya hemwelatiyê me yên ku ji perçeyen di bin îsgala Îran, Iraq û Suriyê têni ji jiyanâ komaleayetiye gelek dûr in. Maf û berpirisiyariya endaman, destûr û ûşûlên rêvebirina civînan her tim mijarêna munaşeyê ne.

# Neynik

## Demokrasî

### û aşkerayî

#### Kurdê Ewrûpayê û deomkrasî

Lê em bi hêsanî dikarin bibejin, em Kurdê ku li Ewrûpayê demeke dirêj mane, me li wir kar kirîye, xwendîye, me ev şansê fêrbûn û idrakkirina demokrasiyê tam bi kar naniye. İdrakkirina demokrasiyê tê wê manê ku dema demokrasî tûşî êrisan dibe an mirov şahidê kirineke nedemokratik dibe, refleksa parastin û xwedî lê derketinê bi mirov re çedîbe. Heta nuha bi geleperî ev xusûsiyet bi me re çenebûye. Di şûna wê de cambazên demokrasiyê çê-

bûne, kesen qalikê wan demokrat, lê naveroka wan tiştek din çebûne, kesen nîv-demokrat -piraniya kesen weha jî ci hikmet e, hêla wan a demokrat dema bi berjewendiyê wan re lihevkirî be, aktuel bûye- çebûne.

Ji ber vê yekê ye "demokrat" ên me wek tovê pirparê zû çedîbin, lê avayî û dezgehîn me yên demokratik çenabin. İro rêvebirê PDK'ê û YNK'ê, di her du hukumetê Kurdistanê de piraniya weziran û gelek berpirsiyaren herêmî yên Başûrê Kurdistanê bi salan li Ewrûpayê jiyan, xwendîne, lê iro em rewşa Kurdistanâ Federe dibînin: Di şûna Kurdistanâneke demokratik de, li gor bi hêzbûna her du partiyê sereke perçeyekî Kurdistanê bûye du perçe. Amnesty International di raporê xwe yên van salên dawiyê de Kurdistanâ Federe jî ji aliye mafîn mirôvan de tawanbar dike, bi deh rûpelan nimûnên îhlalkirina mafîn mirovî ne.

#### Nimûneya demokrasiyê ye

Li Swêdê Federasyoneke Kurdan heye. Li seriya 40'î komeleyen wê hene.

Ji bilî PKK hevalbend, dilxwazên hemû partiyê siyasi yên Kurdistanâ, kesen serbixwe, xort-pîr, jin-mîr endamê vê komelê ne. Neendambûna hevalbendê PKK'ê, ne ji tengiya Federasyonê, ji tengîtina PKK'ê tê. Hevalbendê PKK'ê heta sala 1992'an jî endamên federasyonê bûn. Federasyona Komeleyen Kurdistanâ bi mezinayıya xwe ve avayiya herî mezin a demokratik a Kurda ye. Komeleyen endam di kongreyen xwe de nûneren xwe bi awayekî demokratik hildibjîerin, nûneren komeleyan jî rêvebirê xwe hildibjîerin.

Hesab û kîtabêne wê li rastê ne.

Di kongreya dawîn de şâşî û nelirêyiyan malî yên federasyonê yên 4 sal berê hatin rojevê, li serê hat rawestandin. Qusûr, kîmasî hatin tespîtkirin. Yen dihatin súcdar-kirin hatin guhdarkirin û Kongre, di davîya munâqeşeyan de gihîş qenetekê. Bi vê jî Federasyonê da ispatkirin ku çiqas demokratik e, imkan û mecal hene ku mîrov vegere hesab û kîtabêne 4 sal berê kontrol bike, heger hebe bêusûliyekê, súcekî derxe holê.

Herweha di kongreya dawîn de pirsa cemidandina cîgirekî Komîteya Karkir hante rojevê. Cigirê Komîteya Karkir herçiqas di civîna Komîteya Giştî ya Federasyonê de wezîfeyen wî jê hatibûn wergirtin jî, di kongreya Federasyonê de jê re mecal hat dayin ku rabe xwe biparêze. Ev jî prensibekî demokrasiyê ye ku federasyon bi ser-giraniyeke mezin pêk anî. Lî hîn jî çend kes him di kongreya Federasyonê de, him jî piştî kongreyê Federasyonê de bi dengekî bilind diqîrin ku Federasyon ne demokratik e. Bi vêya jî nemane bi idîaya nedemokratikbûyina federasyonê ji dezge-hen Swêdî re gîf kirine. Li ser navê demokrasiyê û demokratikbûyinê ev "mîr-xasen me" dixwazin Federasyonê hilweşînin... Lî ne entresan e ku yên zikê van ke-san mîz didin ji bo ku karibin zedetir biqîrin, bi navê federasyonê komleyeke din avakirine, li wir yek dengî, yek slogan, yek sûret heye, li wir kes "hewce" nabîne ku pirsa hesabêna malî jî bike... □

Mumtaz Aydin

— "Ji xwe em 8 kes di odayeke 6 metre çargoşe de dijin. Em herroj zarokan dişînin zibilxaneyan ji bo ku nan berev kin, em mezin jî dicin camiyan xératan berev dikin. Me quesabêna Wanê tembîh kirine ku wexta ew goşt difroşin hestiyê ku bi kîrî wan nahêni ji me re vedişerîn û em jî wan hestiyân tînin malê, dikelînin û bi nanê ku zarok ji zibilxaneyan berev dikin em 'ziyatetê' didin xwe".

Wer xwiya ye dewlet di şerî li di jî PKK'ê de gihaşt armanca xwe. Gund û gundiyen Kurdistanê ku piraniya wan li ser sinorê Iraqê bûn, êdî nemabûn; gund wêran bûbûn, gundî jî ji gundên xwe hatibûn derxistin. Dewlet di sala 1987'an de sistêma "Parêz-erên Gundan" danibû û heta nuha li tevâiyê Kurdistanê 55 hezar korucî top kiri-bûn. Herçiqas dewlet di van mehîn dawîyê de hinek çekîn parêzerên gundan ji wan digre jî hîn dixwize ev sistêm berde-wam be.

Dewlet bi avakirina sistêma koricîtiyê di nav eşîr û malbatêne mezin yên Kurdistan de birînênu vekirin; Kurd him li hemberê hev dan kuştin û him jî civata gundîtiyê ji holê rakir. Gundên ku bi salan ji asîmas-yonê xwe parastibûn û potansiyela tevgera rizgarixwaza Kurdistanê bûn di neticeya êrisen dewletê de gelek ji wan taybeti-yen xwe wenda kirin. Û dev jî gundên xwe berdan.

## "Korucî ji dêrê û Mizgeftê bûn"

#### Nimûneya Geverê

Yek ji wan gundan yê Geverê ye. Li gund 150 xane hebûn û nifusa wê nêzî 1500 bû jiyanâ gundîtiyê berdewam dikir. Roj hat ew jî wek gundên cînar korucîtiya dewletê qebûl kirin û huzûra gund reviya. Gundîyên ku korucîtiyê qebûl nekirin û li hember êrisen dewletê serê xwe danexistin terka gundê xwe kirin û berê xwe dan Kurdistanâ azad û di kampa Etrûşê de bi cî bûn. Gundî perişan, rojekê têr û rojekê bir çi ji gundê xwe dûr ketine û jiyanâ xwe berdewam dikin. Nîviyên din ên gundê Geverê ku ji 75 xaneyan û 650 kesan pêk dihat û gelek ji wan korucîti qebûl kiribûn wan ji tevî zarokên xwe li hember êrisen dewletê û neheqîya PKK'ê mecbûr man terka gundê xwe bikin û herin kozîya bajarê Wanê, di xaniyên holikan de bi cî bibin.

#### "Xwarina me ew nan e ku em ji çopê berevdikin"

Wan di rewşike gelek xerab de jiyanâ xwe didan domandin. Di odayekê de 30 kes diman û xwarina wan jî ew nan bûn ku ji çopan berhev dikirin. Muxtarê gund li ser terka gundê xwe wilo digot; "Em di

navbera du agiran de man, dewlet ji aliye-kî û PKK jî ji aliye din. Ji ber wê jî me terka gundê xwe kir. Nîv me cûn kampa Etrûşê û nîv din jî em hatin li Wanê bi cî bûn. Em li vir di rewşike gelek xerab de jiyanâ xwe didominin." Korucî Mihemed jî di dema xwe de çekê dewletê hilgirtibû û ligel jendiraman li dijî PKK'ê şer kiribû lê dewletê dawiyê wek paçekî ew bi kar anî û meş jî neda wî. Ew jî tevî malbata xwe li Wanê di holikan de dijî. Çavekî Mihemed şas bû û çavê din jî baş nedidi, destê xwe yê çepê jî di şerê li hember PKK'ê de seqet hiştibû. Wî li ser jiyanâ xwe ya Wanê digot ku; "Ji xwe em 8 kes di odayeke 6 metre çargoşe de dijin. Em herroj zarokan dişînin zibilxaneyan ji bo ku nan berev kin, em mezin jî dicin camiyan xératan berev dikin. Me quesabêna Wanê tembîh kirine ku wexta ew goşt difroşin hestiyê ku bi kîrî wan nahêni ji me re vedişerîn û em jî wan hestiyân tînin malê, dikelînin û bi nanê ku zarok ji zibilxaneyan berev dikin em 'ziyatetê' didin xwe". Mihemed dewam dikir digot." Lî carna ev nan jî nakeve destê me û em jî zibilxaneyan destvala vedigerin. Ji ber ku tene ciyê ku em lê dijin 100 zarok herroj di-

çin çopan tevlihev dixin." Yanî di neticeyê de em him jî dêrê bûn û him jî mîzgeftê.

Malbatek hebû ku 30 kes di odayekê de dijîyan. Yekî ji wan digot ku em li ciyê xwe rûdinê û pişta xwe didin diwêr û bi vî awayî ançax em karin ciyê raketinê bîbînin.

Muxtarê gund him tercumanî ji gundiyan re dikir û him jî mezinê wan bû. Muxtarê gazin ji dewletê dikir ku ew bêkar û betal in û dewlet alikariya wan nake. Muxtarê digot, ne iş heye ne jî nan heye, hew karê me em zarokan çedîkin û wan dişînin zibilxaneyan".

#### Siyaseta PKK'ê

Gundê Geverê nimûneyeke neticeyâ ji parêzîerên gundan e û rewşa wan li ber çavan e. Ew di welatê xwe de bê welêt, mane. Ma ew gundiyen ku çûne metrepole rewşa wan ji yên gundê Geverê çêtir e. Ew him ji warê xwe bûn û him jî ji zimane xwe. Ji xwe serokê PKK'ê Abdullah Ocalan ji dibêje; "bila korucî gundên xwe terk bikin, herin metropol, herin Iranê, Iarqê û Sûriyeyê, yanî kuda dicin bila biçin". Dewlet bi darê zorê PKK jî bi siyaseta xwe gund vala kirin û siyasteke şaş meşandin ku li hin ciyan gundi çekîn dewletê qebûl bikin û bibin korucîye wê.

Ma hûn ci dibêje ev qedera gundiyan Kurdistanê ye? Yan jî gaddariya dewletê û neticeyâ siyaseta şerê çekîdar e? □

Faris Can



# Zanist û Teknîk

Amadekar: Hesen Mizgin

## Gelo atmosfera dinyayê li her derê di eynî qalindiyê de ye?

Ji bo qalindiya atmosfera dinyayê danîna sînorekî ne mumkun e. Lî pişti 30.000 km bilindiyê qeweta piraniya dinyayê hew dikare atom û molekulan bigre.

Cawa ku mirov dikare iklima dinyayê tebeqe tebeqe ji hev biqetîne, mirov dikare sebebên atmosferê jî ji hev vejetîne. Vejetandina tebeqeyen atmosferê li gor rewşa fizikî, kîmyâyi û metrolojiyê dibe. Tebeqa yekem ku nêzîkê dinya ye Troposfer e û pişti wê Stratosfer, Mesosfer, Termosfer û di dawiyê de jî Eksosfer tê.

Ji % 99'ê atmosferê ji Troposfer û Stratosferê pêk tê û qalindiya wan 30 km ye. Bûyer û kukurtê hewayê jî di tebeqa Troposferê de pêk tê.

Xeta navbera Troposfer û Stratosferê xetek

taybeti ye û jê re Tropopaus tê gotin. Li atmosferê ciyê ku tîn(heraret) pişti daktekinê bilind dibe Tropopaus e. Li tebeqeya Troposferê tîn çiqas bilind diçe hewqas dadikeve. Li gor pîvanênu ku hatine kirin qalindiya Tropopaus ê cend sed metro ye.

Lê Tropopaus li her derê dinyayê ne di eynî bilindiyê de ye û ji ber vê yekê ji qalindiya atmosferê li her derê dinyayê wekhev nabe.

Troposfer li herêmên herî germ qalindirîn e. Li heremên tropikê qalindiya Troposferê dijihje 14-15 kilometreyan û li qitûban di dema zivistanê de qalindiya wê tenê 6 km ye. Paralelén ku em têde ne atmosferê di bin Tropopausê de li zivistanê 6-8 km û li havînê 12-13 km ye. Li gor pîvanênu ku deh salên dawî hatine kirin tropopaus nezî 130 m. bilindir

## Ji bo çi hin zarok tat(devlûte, lêman, zimangiran) dabin?

Dema zarok dest bi axaftinê dikan, piraniye wan di 2-3 mehîn pêsiyê de hece û keliman dubare dikan. Pişti demeke kurt zimanê zarakan kîşîntir dibe lê hin zarok di periyoda dubarekirina hece û kelimeyan de dimînin. Ji vê yekê re tatbûyîna klonik tê gotin.

Zarokên ku di periyoda tatbûyîna klonik de ne bi listikên stranî, xwendina bi dengê bilind û bi tevgerên din dikarin ji tatbûnê xelas bîbin.

Ya girîng ew e ku dê û bay tatbûna zarok nakin problem. Zordana ji bo axaftina normal dibe sedema rawestandinê ku ev yek jî di be sebeba tatbûna fonik. Di vê periyodê de zarok herfîn bêdeng bi rehetî dikarin derxin lê dema dor tê herfîn bideng(vokal) kasen sing û qirikî hevkîn nakin. Di vê rewşê de alîkarya pedagogên axaftinê divê.

Lêkoler bawer dikan ku tatbûn ji ber bê balansiya gîhiştina du nîvîn mîjîyî ye. Ji bilî vê problem dikare irsî be jî.

## Em çîma li çepikan dixin?

Ji bo ku em kîfxweşîya xwe, dilxweşîya xwe şan didin em li çepikan dixin.

Dema em ji bo yekî li çepika dixin em daxwaziya xwe ya hemêzkirinê nîşan didin. Helbet hemêzkirin li nav me Kurdan têrake. Di vê meriv hevûdû maç jî bike. Çepik lêxistin bi taybeti li Ewrûpayê, di çanda rojavayê de adet e.

Ji ber ku temeşvan nîkarin xwe bigîhînîn kesê ku di sahneyê de ye û jê pir dilxweşî û kîfxweş e. Dilxweşî û kîfxweşîya xwe bi lêxistina çepikan nîşan didin.

Eger meriv bala xwe bide dê mirov bibîne ku dema çepiklêxistinê tenê destê rastê diçê û tê. Temeşvanê dilgerm gelek caran milen xwe didin pêş û li çepikan dixin.

## Li dinyayê kîjan derya mezintirîn e?

Okyanûsa Mezin li dinyayê mezintirîn derya ye. Firehiya wê 16 milyon km çargoşe ye.



## Gelo mir dikarin ducan (hemîle) bin?

Bersiva vê pirsê; "belê" ye. Lî helbet ev yek ne hewqas hêsan e, hin rîskên xwe yên taybeti hene.

Hêkîn tamijandî di zikê mîr de li keksa üreke musaîd tê bicîkirinê. Laşê mîr bi hormonên jinan tê hazirkirinê û hormondayîn di vê di dema bihemlebûyinê de jî dom bike. Ji bil vê jî divê mîr tim û tim di bin kontrolê de be, da ku xwînherikîn û astengên din dernekevin holê.

Zayîna zarok helbet divê bi sezeryanê, bi emeliyatê bibe.

## Di laşê însanan de çend lemlete(zeblek, kas) hene?

Ji zêdeyî 600 lemlate di nav hevkariyeke bi aheng de dikan ku em bikarîbin xwe bilivînîn. Lemlate nêzî nîvî giraniya însanan.

Jinê Neteweyî yên Şoreşger

## "Em her rojê bikin 8'ê Adarê"

Istenbol: Bi munasebeta pîrozkirina 8'ê Adarê, Roja Jinan a Cihanê li Stenbolê li MED-KOM'ê di navbera 8-16'ê Adarê de çalakiyên cûr be cûr yên jinan çebûn. Di 8'ê Adarê de da-xuyaniyek çapemeniyê ku ji aliyê Platforma Jinê Kurd (Grûba Jinê Kurd a Azadîyê, Grûba Lêkolînê ya Jinê Kurd a MED-KOM'ê, Kovara Roza ya Jinê Kurd û Komeleya Neteweyî ya Jinê Kurd) li MED-KOM'ê hate xwendin.

Hevpeyvîna ku di 8'ê Adarê de di Radyoya Mavî FM de hat veşandin û li ser navê Platforma Jinê Kurd besdarî hatibû kirin de, giranî li ser dîroka têkoşîna bi rîxistina ya jinê Kurd di rizgariya têkoşîna neteweyî de û nîrîna jinê Kurd li ser 8'ê Adarê hat sekinandin.

Sempozyuma ku li Navenda Çandî ya Almanî de hat amedekirin û Grûba Lêkolînê ya Jinê Kurd a MED-KOM'ê, Mor Çati, Kadın Kutuphanesi û Pazartesi Dergisi besar bûbûn, nûnera MED-KOM'ê li ser van xalan sekinî. 1-Di rewşa mitingehkariyê de rewşa iina Kurd û zordariya li ser wê, 2-Astengen kultura İslâmî û feodalîyên li pêsiyâ pêşketina jina Kurd, 3-Beşdarbûna jina Kurd a têkoşîna neteweyî û parastina kultura Kurdî ji asımlasyonê. 4- Çalakiyên rîxistinê jinan ê Kurdistanê yên li 4 perçeyan 5-Kar û xebata Grûba Lêkolînê ya Jinê MED-KOM'ê.

Şahiya Lêkolîna Grûba Lêkolînê ya Jinê MED-KOM'ê û Kovara Roza ku li MED-KOM'ê hat lidarxistin gelelek sên û dewlemend bû. Pişti axaftina 8'ê Adarê ozan Nevînê bi ûd û dengê xwe yê xweş şev geş kir. Ozan Bengîn û Grûba Ahûra Mazda jî besarî şevê bûn û şev dewlemendtir kirin. Bi navê "Jina Kurd li metropolitan" forumek hat pêşkêşkirin. Girtiyen KAWA û YEKBÜN'ê û Komisyonâra Plarforma Yekîtiya Jinê Kurdistanê ji şevê re mesaj şandin.

Herweha bi munasebeta 8'ê Adarê bi imza Jinê Neteweyî yên Şoreşger li Stenbolê belavokek hate belavkirin.



Di belavokê de bi giştî li ser rewşa jinê Kurd û ciyê wan û di têkoşîna tevgera rizgarîxwaz a Kurdî de radiweste û wiha dibêje; "Çawa ku çin û tebeqeyen neteweyî li ser esasê berjewendiyen xwe yên taybeti dîbin yek û têkoşîna xwe li ser vî esasî bi rî ve dîbin, mafê jinan jî heye ku li ser esasê pîrsen xwe yên jîntiyê bibin yek û ji bo bidesxistina mafê xwe û wekhevîya mîr û jinan rîxistinê cihê pêk bînin."

Di belavokê de bi berfirehî li ser rewşa jinan û sedemên paşdemayina wan hatiye rawestan û weha tê gotin; "Herçend ku hewldanen ji perspektifîn politik bêpar di nava xwe de wateyek wan hebe jî, ew nikarin rizgariya jinan bîghînîn encamên bingehîn. Li welatekî mîtingeh wek yê me, mirov nikare têkoşîna jinan ji têkoşîna polîtîk a bi giştî ya gelê Kurd cuda bike."

Di encamê de jî, li ser fedakariyên jinan ên di têkoşîna rizgariya gelê Kurd tê rawestan û weha tê gotin; "Divê jinê welatparêz û rençder yên Kurdistanê li ser bingeha berjewendiyen xwe yên taybeti tevgeren berxwedanê ya bêrawestan geş bikin û vê têkoşînê bi rîxistineke xurt û bi zanebûn bidominin. Em jinê Neteweyî yên Şoreşger bi biryârdariya ku têkoşîna bi şeref a doh û fro ya gelê xwe û ya jinê Kurd bi perspektîfa xwe ya sosyalist û şoreşgerî re bikin yek û ji bo biserxistina doza gelê xwe ya biheq bi canfedayî bixebitin". Belavok bi şîara "Em her rojê bikin 8'ê Adarê" bi dawî tê.

Herweha Yekîtiya Jinê Kurdistanê li Swêdê jî ji bo pîrozkirina 8'ê Adarê gelek çalakiyan li dar dixin. Çalakiyên wê hefteyekê dom dikin. Di vê hefteyê de semîner, panel, civîn û meşten organîzekirin.

■ Herweha Yekîtiya Jinê Kurdistanê li Swêdê jî ji bo pîrozakirina 8'ê Adarê gelek çalakî li dar xistin. Çalakiyên wê hefteyekê dom kirin. Di vê hefteyê de semîner, panel, civîn, meşhatin organîzekirin.

1993

Ebedin TAŞLI/Hazro-Diyarbekir  
 Ahmet ŞAHİN/Hazro Diyarbekir  
 Ahmet ÇAKICI/Hazro-Diyarbekir  
 Üzeyir KURT/Bismil-Diyarbekir  
 Turan DEMIR/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 M. Şah ATALA/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Hasan AVAR/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Şerif AVAR/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 M. Salih AKDENİZ/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Nusrettin YERLİKAYA/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Behcet TUTUŞ/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Bahri ŞİMŞEK/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Abdo YAMUK/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 A. Celil AYDOĞAN/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Umit TAŞ/Alacakoy-Kulp-Diyarbekir  
 Murat ASLAN/Diyarbekir  
 Bahri KAĞANASLAN/Varinca-Hazro-Diyarbekir  
 Abdülvahap TIMURTAŞ/Sırnex  
 İbrahim AKIL/Sırnex  
 Hikmet ŞİMŞEK/Sırnex  
 Hamdi ŞİMŞEK/Sırnex  
 Salih DEMIRKAN/Sırnex  
 Halit ÖZDEMİR/Sırnex  
 Semdin CULAS/Sırnex  
 Hüseyin UĞURLU/Altinova-Muş  
 Ramazan TAŞKAYA/Urfa  
 Nezir TEKÇİ/Yekmal-Yüksekova-Hakkari  
 Abdülselam ŞAHİN/Mure-Yüksekova-Hakkari

1994

Abdullah TEKİN/İdil-Sırnex  
 Ahmet OCUN /İdil-Sırnex  
 Safure YILDIRIM/Merdin  
 Abdullah AKSOY/Dêrik-Mêrdin  
 Hüseyin AKSOY/Dêrik-Mêrdin  
 Salih AKSOY/Dêrik-Mardin  
 Halil ACAR/Midyat-Mêrdin  
 Abdülvahap KOÇER/Erzirom  
 Mahmut KOÇER/Erzirom  
 Ramazan ŞARLI/Tatvan-Bidlis  
 Cemile ŞARLI ( Tatvan-Bidlis  
 Abdullah PİŞKİN/Eruh-Sert  
 Salih ÇALIK/Kadıköy-Diyarbekir  
 Sinan ÖZKAYA/Kadıköy-Diyarbekir  
 Ahmet TEKİN/Kulp-Diyarbekir  
 M. Mehdi AKDENİZ/Kulp-Diyarbekir  
 Kudusi ADIGÜZEL/Kulp-Diyarbekir  
 Mirze ATEŞ/Kulp-Diyarbekir  
 Cezayir ÖRHAN/Kulp-Diyarbekir  
 Selim ÖRHAN/Kulp-Diyarbekir  
 Hasan ÖRHAN/Kulp-Diyarbekir  
 Ahmet BATUR/Kulp-Diyarbekir  
 Hikmet ŞAHİN/Lice-Diyarbekir  
 Hüseyin HARAN/Lice-Diyarbekir  
 Mahmut ÖZER/Lice-Diyarbekir  
 Ahmet ÖZDEMİR/Lice-Diyarbekir  
 Mehmet TANRIVERDİ/Lice-Diyarbekir  
 M. Can AYŞIN/Lice-Diyarbekir  
 Tahsin ÇİÇEK/Lice-Diyarbekir  
 Ali İhsan ÇİÇEK/Lice-Diyarbekir  
 Çayan ÇİÇEK/Lice-Diyarbekir  
 Piro AY/Dêrik-Mardin  
 Fahri BULUT/Lice-Diyarbekir  
 Ramazan BULUT/Lice-Diyarbekir  
 Ekrem BULUT/Lice-Diyarbekir  
 Mustafa BULUT/Lice-Diyarbekir  
 Ali BULUT/Lice-Diyarbekir  
 Servet İPEK/Lice-Diyarbekir  
 İkram İPEK/Lice-Diyarbekir  
 Seyitxan YOLUR/Lice-Diyarbekir  
 Süheyle KARAKAYA/Lice-Diyarbekir  
 Sahir ONER/Lice-Diyarbekir  
 Recep ÇELİK/Lice-Diyarbekir  
 Recai AYDIN/Cinar-Diyarbekir  
 Mehmet GÜNKAN/Hani-Diyarbekir  
 Ahmet DEMIREL/Hazro-Diyarbekir  
 Turgut YENISOY/Bismil-Diyarbekir  
 Eyüp AKDEMİR/Diyarbekir  
 Zeki DAG/Diyarbekir  
 İsmail AKAN/Midyat-Mêrdin  
 Şerafettin ERSOY/Ömerli-Mêrdin  
 Osman AKYAL/Ömerli-Mêrdin  
 İzzettin GULTEKİN/Ömerli-Mêrdin  
 Kasim AY/Nusaybin-Mêrdin  
 Ahmet AKBAŞ/Ovacık-Lolanter-Dêrsim  
 Huseyin ULUCAN/Ovacık-Dêrsim  
 Ali GÜR/Ovacık-Dêrsim  
 Hidir OZTURK/Ovacık-Dêrsim  
 Mehmet AKGUN/ Kızıl-Hozat-Dêrsim  
 Ibrahim GENCER/Kızıl-Xozat-Dêrsim  
 Nazim GULMEZ/Taritli-Kozat-Dêrsim



**ELIYE HECİ MIHEMEDÊ SADIQ** • *Leşkeran topek li mala wî dan, çengê wî jê kirin. Paşê ji kontrgerilla bi narincakan mala wî gulebaran kirin û kurê wî, keça wî û neviya wî kuştin û ew bi xwe ji careke din ji pişa wî birîndar kirin. Ev resim resimê mir(h)ovîtiya dewletê ye.* (Foto: Arif Zêrevan)

## MIR(H)OVAYETÎ

Erê Kurdo!

Da ku wêneyên te hêjayî bejna xewnen bin û çavkaniyên sosretê ji hêjayî şewaten giyan û çîlmisîna gula xwînê bin, divêt tu wisa bî Kurdo!

Da ku kuştina te, serjékirina berbanga te, kayikkirina pîpinik û razen êvara te hêjayî pîrsa axa welitekî mîşinî û xaçkirî bin, divêt tu wisa bî Kurdo!

Da ku endamên laşê te li ser nexşeya gerdûn hînî rehaçikandin û xwelibakirinê bin, divêt tu wisa bî Kurdo!

Û da ku sîngâ te robarên axîna xwe ber bi mehrecana birînan de derbike, divêt tu wisa bî Kurdo!

Asoyen te bêba, awirên te şikestî û surdar in. Bi dêmên zuha û bi lêven terikî tu li çirên xemgîn ên rojhilate temâse dikî!

Destê te termê bendemanê di goristana niştiman de vedişere.

Destê ku gulî û biskîn demsalan dihûne.

Destê ku perdeyên demê li newqa deşt û zozanan dialîne. Destê ku qûma jîbir-kirinê bi ser hinarkên Agirî û Zîlan de direşine. Destê ku hespên Ferat hogîrî cirîda sînor û mayinan dike. Destê ku cawekî reş ji boyî reşgirêdana dayikan dipîve. Û destê ku destê sibehê xatir ji şehîdan dixwaze.

Destê te bi kû de cû Kurdo!?

Tiliyên te ku hînî nermebaranê bûbûn, ku di şevistanên zivistanê de li ber denge sirûd û serpêhatiyan û bi nanê tenûre re perwerde bûbûn. Tiliyên te ku çavkânî didiqdîqandin û rîberiya bagerê dikirin û sîngâ berbeyaniyê li ber tîrêjîn hetavê vedikirin. Û tiliyên te ku bi nav û pîrsan; bi stiran, zarok û jinan; bi pencere, dergeh, keleb û ronahiyê hinekirî bûn.

Tiliyên te bi kû de cûn Kurdo!?

Mirovayetî ev e Kurdo!?

Segên har û nehişî êrîşî sîbera xewna te dikin. Cihan ji bi qurzîka çavên xwe li laşê te yî talanbûyi temâse dike. Bêdengî ye Kurdo! Destê xwe hînî jîyanê bike, da ku zengîlê azadiyê bêxwedî nemîne. Tiliyên xwe hînî dîlok û sıruðan bike, da ku mirina me ji dengê tembûra te bêpar nemîne.

Û çavên xwe kurdo, çavên xwe li sitêrka karwanan bigerîne, da ku em û tu li ber dergehê vê dîroka likumî bêrêber û rîdar nemînin.

**Komeleya Mafêن Mirovan a Diyarbekirê di 2'ê Sibata 1996'an de, ev rapor li ser mirovên ku li Kurdistanê bêserûşûn bûne belav kir. Ev liste nimûneyek ji mir(h)ovîtiya dewletê ye.**

Nazim BABAOĞLU/Siwerk-Urfa  
 Mustafa SAYGI/Suruç-Urfa  
 Fethi YILDIRIM/Wêranşehr-Urfa  
 Alaattin YALÇIN/Wêranşehr-Urfa  
 Eyüp KAPLANDERE/Wêranşehr-Urfa  
 Şerif BUDAK/Cizre  
 İzzettin ACET/Cizre  
 Emin KAYNAR/Cizre  
 Ebubekir ARAS/Cizre  
 Resul ŞAKAR/Cizre  
 Muhsin TAŞ/Cizre  
 Abdülselam ŞAHİN/Yüksekova-Hakkari  
 Abdülselam ŞAHİN/Murel-Yüksekova-Hakkari  
 Sidik BİNGÖL/Şemdinli-Hakkari  
 Casim ÇELİK/Şemdinli-Hakkari  
 Hasan TEKİN/Onhacilar-Yüksekova-Hakkari

Bayram TEKİN/Onhacilar-Yüksekova-Hakkari  
 Abdulnasir TEKİN/Onhacilar-Yüksekova-Hakkari  
 A. Hamdi YARDIMCI/Onhacilar-Yüksekova-Hakkari  
 Refik YARDIMCI/Onhacilar-Yüksekova-Hakkari  
 Tunç YEMEN/Onhacilar-Yüksekova-Hakkari  
 Mehmet TUNÇ/Kıziltepe-Mêrdin  
 Yusuf TUNÇ/Kangerli-Köyü-Batman  
 Zeynel KÜRSAP/Batman  
 Ahmet YETİŞEN/Batman  
 Fehrettin TAN/Batman  
 Enver DEMİR/Batman  
 Ismail AĞAYA/Batman  
 Beşir AKBULUT/Batman

Ahmet DEMİR/Batman  
 Yılmaz GÜMÜŞ/Batman  
 M. Emin DOĞRU/Batman  
 Fetih AVŞAR/Batman  
 İlhan BEYAZ/Batman  
 Ali TEKDAG/Diyarbekir di Adara 1995 an de girtin bin çav pişti gelek işkence, ew dan ber gûla  
 Hasan SELİM  
 Mehmet SELİM  
 Mehmet ATEŞ  
 Ali BEKİR  
 Haci SAIT  
 Nejat ÇELEBİ  
 Düzali SERİN/Dêrsim  
 Yeter SERİN/Dêrsim  
 Elif SERİN/Dêrsim  
 Şirin SERİN/Dêrsim  
 Hatun SERİN/Dêrsim  
 Xidir İSİK/Dêrsim

1995

İmam UZÜN/Ovacık-Dêrsim  
 Hüseyin BİLEN/Ovacık-Dêrsim  
 Hayder YILMAZ/Wan-Başkale  
 Beşir SAYIN/Wan-Başkale  
 M. Emin YILMAZ/Wan-Başkale  
 Yusuf AKTAŞ/Wan-Başkale  
 Edip AKSOY/Diyarbekir  
 Bedri ALGAN/Diyarbekir  
 Ahmet CİNGÖZ/Diyarbekir  
 M. Zafer DEMİRKIRAN/Diyarbekir  
 Ender TOĞCU/Diyarbekir  
 Fehmi AKYUREK/Diyarbekir di 09-11-1995 an de laşê wî hat dîtin  
 Abdülbaki İŞIK/Diyarbekir di 09-11-1995 an de laşê wî hat dîtin  
 Ramazan AYHAN/Diyarbekir di 09-11-1995 an de laşê wî hat dîtin  
 Bahri KAYA/Diyarbekir  
 Umut KAYA/Diyarbekir  
 Eşref BAYRAM/Diyarbekir  
 Cemil ASLAN/Diyarbekir  
 Osman BULUTTEKİN/Kulp-Diyarbekir  
 M. Nuri AYTA/Hani-Diyarbekir  
 Servet BAYRAM/Hazro-Diyarbekir  
 Metin YILDIZ/Erxanî-Diyarbekir  
 Isa AYDIN/Dicle-Diyarbekir  
 Ömer SÖĞÜT/Dibek-Licê-Diyarbekir  
 Ali İhsan DAĞLI/Eşme-Silvan-Diyarbekir  
 Muhittin OLMAZ/Bismil-Diyarbekir  
 Selahattin AKBULUT/Mehmetşîrvan-Bismil-Diyarbekir  
 Reşit YILDIZ/Çilesiz-Nusaybin  
 Davut ALTUNKAYNAK/Dargeçit-Mêrdin  
 Nedim AKYIL/Dargeçit-Mêrdin  
 Süleyman SEYHAN/Dargeçit-Mêrdin  
 M. Emin ASLAN/Dargeçit-Mêrdin  
 Seyhan DOĞAN/Dargeçit-Mêrdin  
 Kemal BİRLİK/Kızıltepe-Mêrdin  
 Zübeyir BİRLİK/Kızıltepe-Mêrdin  
 Abdülbaki BİRLİK/Kızıltepe-Mêrdin  
 Zeki ALABALIK/Kızıltepe-Mêrdin  
 Abdüllatif YAĞIZAY/Nusaybin-Mêrdin  
 Hatice ŞİMŞEK/Savur-Mêrdin  
 Cemil ÇELİK/Ömerli-Mêrdin  
 Süleyman ABAK/Mêrdin  
 Abdurrahman ABAK/Mêrdin  
 Mehmet MORGÜL/Akçadag-Genç-Bingöl  
 Ramazan ÇELİK/Akçadag-Genç-Bingöl  
 Mehdin Çelik/Akçadag-Genç-Bingöl  
 Reşit YILMAZ/Akçadag-Genç-Bingöl  
 Hüseyin KAYA/Akçadag-Genç-Bingöl  
 Sabri ELÇAY/Kozluk-Batman  
 Şeyhmus EROĞLU/Batman  
 Yılmaz ÖZDEMİR/Antap  
 Bülent TÜRKmen/Urfa  
 Murat ZÜLUF/Urfa  
 Yusuf KESTOP/Urfa  
 Musa ÇELİK/Urfa  
 Sükrû GÜLER/Urfa  
 Abdullah YAĞLI  
 Beşir YILMAZ/Hakkari  
 M. Emin YILMAZ/Hakkari  
 Hayder YILMAZ/Hakkari  
 Yusuf AKTAŞ/Hakkari  
 Kerevan İRMEZ/Silopi-Sırnex

1996

Omer KARTAL/Silopi-Sırnex  
 Mehmet FINDIK/Silopi-Sırnex  
 M. Emin FINDIK/Silopi-Sırnex  
 Tekin DEMİR/Diyarbekir  
 Hanîfe YAMAN/Lice-Diyarbekir  
 İsmail ECE/Dara-Mêrdin  
 Ahmet ATA/Dara-Mêrdin

Rûpelek ji dîroka me ya hevdem

3

Zinar  
Soran

# D Devrimci D Doğu K Kültür O Ocakları

## Mitinga Kozlukê (Hezoye):

**D**DKO ya Kozlukê di 28-ê Çelya Pêşin a 1970-yî de, tê damezrandin. Di vekirina ve komeleyê de ji wîlayet, qeza û gun-dên cîran ji gelek welatparêz û rew-şenbîren Kurdan besdar dibin. Kesên diaxifin, li ser zilm, zordarî, kul û derdê Kurdan û daxwazên wan rawestin. Hinek mele û feqeyên welat-parêz bi kurdî axaftinên xwe dîkin. Li ser vê rewşê, karbidesten dewletê û hevalbendê wan zilm û zordariyeye mezin tînin ser komeleyê û kesenê welatparêz. Ji bona protestokirina vê zilm, zordariyê û van êrîşen hov, DDKO'ya Kozlukê biryar dide ku mitingekê li dar xîne. Teva hemû tade û astengiyê karbidesten dewletê,

ev mitîng di 8-ê Adara 1971-ê de çedîbe. Ji Stenbol, Ankara, Erxenî, Batman, Silîvan, Swêrek, Baykan û wîlayet, qeza û gundê din bi hezaran kes besdarî mitîngê dibin. Di axaftinan de, zilm û zordesiya karbidesten dewletê û hevalbendê wan tê protestokirin û li ser sedem û rastiya zordariya komandoyan tê rawestandin. Hinek kes axaftinên xwe bi kurdî dîkin û piştigiriya xwe ya bi xelkê Kozlukê re didin diyarkirin. Beşdarekî ji Batmanê jî di beşkî axaftina xwe de, li ser hebûna gelê Kurd weha dibêje:

*... Li Tirkîyê gelê Kurd heye. Û mafîn Kurdan jî heye ku weke mirovan bijîn. Gava ku em dixwazin hemû neteweyen dînyê û hemû gelên Tirkîyê vê rastiyê bizanibin, em dîbin Kurd; em kurdayetiyê bi serbilindî qebûl dîkin...*

Di mitîngê de, durişmîn "Bimre Faşizm", "Ji Gelan re Azadî", "Ji Rojhîlatê re Azadî" û "Bimre Zalîm" tên avetin. Piştî mitîngê, ji bona çavê millet bitirşinîn, deh cemse komando di kevin nav Kozlukê û çavşorîyê li xelkê dîkin.

Li gor agahdariyên ku Dr. İbrahim Etem Gürsel dide; vê tevgerê, piştî mitîngâ Kozlukê, di 24-ê Çileya Paşîn ya 1971-ê de bi mitîngâ Batamanê û di 8-ê Sibata 1971-ê de jî bi mitîngâ duyem ya Kozlukê berdewam kiriye. Ev pêla mitîngan ku li ser bingehê neteweper-weriya grûbî dihate çekirin, ançax bi muhtiraya 12-ê Adarê, bi girtinan hinek kesan û qedexekirina van rîexistinan, herweha bi idareya awarte ya li vê navçeyê, dawî lê hatiye (14).

Beriya avakirina DDKO'ê jî xwendekarên ku ji bajarêñ Kurdistanê hatiye bûn û li dibistanê bilind dixwendin, bi navê bajarêñ xwe şevê şahîyê çedîkirin. Di nav salêñ 1966 û 1968-an de, yazdeh şevê weha hatine amadekirin. Lî armanca van şevan ya bingehê hevnaskirin, şahî û alîkariya komeleyen xwendekaran bûn. Piştî damezrandina DDKO yê jî hem li ser navê bajarêñ Kurdistanê û hem jî bi navê cihê şevê weha hatin amade kîrin. Lî di şevê piştî damezrandina DDKO yê de, pirs û pirsgirêkîn siyasi, helbest, stran û folklorâ kurdî bêtir cih girtine. Ji bona alîkari û piştigiriye, gelek rewşenbîr û welatparêzen Kurdan yê ku ne endamên DDKO yê bûn jî besdarî van şevan bûne.

## Amadekirina konferans, panel û semîneran

Xebat û çalakiyeke berbiçav a DDKO yê jî amadekirina konferans, panel, semîner û civînen sohbete bûn. Di van panel, semîner û civînan de li ser mijaren siyaset, felsefe, ziman, dîrok û pirsgirêkâ kurdî dihate rawestandin; di warê ideolojik û siyasi de gotûbêjîn pîralî dihatin kîrin. Ew panel û civîn ji bo xwendekar û ciwanîn Kurdan dibûn weke dibistanekî siyasi; di warê têgihiştandina pîrsen siyasi, felsefeyî û belavkirina nêrinê welatparêzi, cep û şoreşgerî de rolên girîng dilîstîn. Ji aliye kî xeteke cep û şoreşgerî di nav xwendekarêñ Kurdan de şax vedida, ji aliye din jî têkoşîn û gotûbêjîn siyasi û ideolojik yê bi çepen Tirkân û Kur-

dên di nav partî û komeleyen Tirkân de roj bi roj geşir û berfirehtir dibûn. Pêvajoya vejetandina ji komele û partîyên Tirkân her ku diçû xurtir dibû û tovê avakirina partî û grûbîn siyasi yê serbixwe, hûrik hûrik dihate çandin.

Ji bona desîfrekirina zilm û zordariya dewletê DDKO yê gelek belavok, afîş û neh bultenê taybeti belav kiri-ne. Di van bulenan de, li ser rewşa Dînyê, Tirkîyê û Rojhîlatê Navîn, li ser zilm û zordariya gelê Kurd, ziman û çanda wî, li ser bûyeren girîng yê li Tirkîyê û Kurdistanê û çavşorî û sîtemkariya karbidesten dewleta Tirkîyê, li ser pîrsen rîexistiniyê, xebat û çalakiyên DDKO yê û bi taybeti li ser operasyonê komandoyan yê li navçeyen Kurdistanê dûr û dirêj hatiye rawestandin.

## -IV- Operasyonê komandoyan û erîşen li hember DDKO yê

**D**i salêñ 1960-an de, tevgera Kurdistanê roj bi roj geşir û berfirehtir dibû. Di sala 1965-an de komîk welatparêzen Kurd li başûrê Kurdistanê rîexistineke serbixwe û ilegal ya bi navê Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyê (PDKT) damezrandin. Piştî wê bi demekê, hinek xwendekarêñ Kurd yê ku li metropolê dixwendin, di sala 1967-an de bi awakî dizî Koma Azadiya Kurdistanê (KAK) ava kîrin. Di sala 1967-an de, li gelek deveren Kurdistanê mitîng hatin çekirin. Di van mitîngan de rewşenbîr û welatparêzen Kurdan zilm û zordariya li ser gelê Kurd bi awakî eşkere anîn zimên. Di gulana 1968-an de, pîşîye li Ankara'yê, bi dû re li Stenbolê û gelek bajarêñ Kurdistanê DDKO hatin avakirin. DDKO ji aliye gelê Kurd ve bi coş û heyecaneke mezin hate himbêzkirin. DDKO di demeke kurt de bû hêvî û navendeke girîng a siyasi û kulturî. Bi avakirina DDKO yê bingehê tevgera neteweyî ya Kurdistanê firehtir û şiyarbûna neteweyî û bîrûbawerîyêñ cep û şoreşgerî jî geşir bûn. Gava li bakurê Kurdistanê ev xebat û pîşketin çedîbûn, li başûrê Kurdistanê jî şoreşîa neteweyî Kurd ya ji bona bidestxistina otonomiya Kurdistanê roj bi roj berfirehtir û geşir dibû. Di 11-ê Adara 1970-yî de, şoreşîa Kurdistanê Başûr dewleta Iraqê neçarî peymana otonomiyê kiribû. Ev serketin ji bo gelê Kurd yê bakurê Kurdistanê jî kîfxwesi, şahî, hêvî û heyecaneke mezin afîrandibû.

Li hemberî vê pîşketin û şiyarbûna neteweyî, karbidesten dewleta Tirkîyê ketin nav tirs û xofeke mezin. Wan nedixwestin ku bi tu awayî hêvî û moralî neteweyî di nava neteweyî Kurd de ges bibe. Lewra jî, ji bona pêsiya vê pêşketina siyasi, rîexistinî û şiyarbûna neteweyî bigrin û çavê gelê Kurd careka din bitirşin, karbidesten dewleta Tirkîyê dest bi hinek hazîrî û planen taybeti kîrin. Bi behaneyâ "lêgerîna li çek û mahkûman" bi hezaran komandoyan taybeti di destpêka sala 1970-yî de li gund û bajareñ Kurdistanê dest bi operasyonan kîrin. Di van operasyonan de, bê ku ferqê di nav kal, pîr, zîlam, pîrek û zarokan xînîn zilm, zordarî û teroreke mezin kîrin. Wê zilm, zordarî û terora hov bi qasî salekê berdewam kîr. Erişen komandoyan li gund û bajareñ ku tevgera neteweyî û şiyarbûna kurdayetiyê li xurt bûn, gelekî dijwartir û berfirehtir bûn.

Di dawiya sala 1970 û di destpêka 1971-ê de li Erxenî, Silîvan, Kozluk, Diyarbekir û Batmanê DDKO hatin vekîrin. Xebat û têkoşîna neteweyî li van herêman roj bi roj xurtir û berfirehtir dibû. Loma jî, operasyonê komando bi giranî li van navçeyan dest pê kîrin. Teva wê zilm, zordarî û terora neînsanî jî rewşenbîr, xwendekar û welatparêzen Kurdan li gelek bajareñ Kurdistanê bi besdarîyen mezin mitîng çekirin û bi dengê bilind ev zilm û terora dewletê protesto kîrin. Lî di gel vê berxwedana gelê Kurd, operasyonê komando jî roj bi roj berfirehtir dibû. Navçeyen Culemêrgê, Mêrdin, û Sîrtê jî ketibûn nav sînorêñ êris û operasyonan.

Ji bona desîfrekirina vê terorê û agahdarkirina raya giştî, DDKO jî di nav xebat û têkoşîneke pîralî de bû. Li ser zilm û zordariya operasyonê komandoyan, ji gelek gund û bajareñ Kurdistanê ji DDKO yê re name û agahdarî dihatin. DDKO yê jî ew agahdarî bi riya belavok û civînen çapemeniyê belav dikirin. Lî ji derveyî hinek istisnayan, çapemeniya Tirkîyê li hemberî wan operasyonan bîdeng di man. Ji bona ku hin lêkolînan û dîtina bûyeran di cih de, endam û berpirsiyâren DDKO yê xebateke taybeti dimeşandin. Di 12-ê Nîsana 1970-yî de, li ser navê DDKO ji aliye Agah Uyanik, Ömer Bakal, Şeref Yıldız, Ahmet Zeki Okçuoğlu, Erdinç Uzunoğlu, Abdu Adıgüzel li ser operasyonê komando yê li navçeyen Kurdistanê, ji Diyarbekirê telgrafek ji serokkomar Cevdet Sunay re hate sandin. Piştî, ev telgrafa weke belavokekê hate amade kîr û li Diyarbekirê hate belavkirin.

Di 20-ê Nîsana 1970-yî de, sekretarya giştî ya serokkomar bersîva vê telgrafek dide û daxwaza agahdarîyen berfirehtir dike. Li ser vê daxwazê, di 15-ê Gulana 1970-yî de DDKO raporeke lêkolîne li ser operasyonê komandoyan amade dike û ji serokkomar re dişîne. Ev rapor ji du beşan pêk hatiye. Beşê pêsi, weke pêşgötinekê hatiye amade kîrin û li ser sedemê amadekirin, awa û pêvajoya amadekirina raporê hatiye rawestandin. Beşê du-yem, rapora bingehîn pêk tîne. Di vi beşî de, encamên hinek lêkolînan hatîne pêşkêskirin ku li navçeyen operasyonê komandoyan, bi cend bûyeren

taybetî yên ku li Silivanê, gundêñ Diyarbekirê, Bismilê, Şermixê, Dêrikê, Midyatê, Stewrê, Sêrtê û Erûhê hatibûn holê. (15).

## Kongreyê DDKO

Di 3-ê Gulana 1970-yî de, DDKO ya Ankarayê li lokalâ komeleyê kongreya xwe ya yekem dicivîne. Li derdora 80 kesan besdarî kongreyê dibin.

Di kongreyê de komîteyeke nû ya karger tê hilbijartin. Kesêñ di kongreyê de axaftin kirine ev bûn: İbrahim Güçlü, Nezir Şemmiranlı, Mümtaz Kotan, Süleyman Atay, Mehmet Demir, Sabri Çepik, İhsan Yavuztûrk, Mustefa Karacadağ, Hikmet Bozçalı, Niyazi Dönmez, Nusret Kılıçaslan, Ahmet Karasu, Muamer Kâçalî û Ali Bucak. Di vê kongreyê de İbrahim Güçlü, Zeki Kaya, Fikret Şahin, Sabri Çepik û İhsan Yavuztûrk weke komîteya karker têne hilbijartin û İbrahim Güçlü dibe serokê DDKO'ya Ankarayê.

Li gor agahdariyên ku Eyyüp Alacabey dide, pişti kongreya damezrandinê du kongreyê DDKO ya Stenbolê çedibin. Di kongreya duyem de Hikmet Bozçalı, Niyazi Dönmez, Ömer Bakal, Zeruk Vakıfahmetoğlu weke komîteya karker têne hilbijartin û Hikmet Bozçalı dibe serokê komeleyê. Kongreya sêyem jî berî bi girtina DDKO bi hindîkî tê civandin. Di kongreya sêyem de Mehmet Tüysüz, Eyyüp Alacabey, Sait Pektaş, Mahmut Fırat û Cemşid Bilek weke komîteya karker têne hilbijartin. Mehmet Tüysüz dibe serok û Eyyüp Alacabey jî dibe sekreterê dawîn yê DDKO ya Stenbolê (16).

Weke ku me li jor jî bi kuratayî dabû diyarkirin, karbidestêñ dewleta Tirkîyê ji pêşketin û şiyarbûna tevgera Kurdistanê nerehet dibû û ji bo pêşîya vê pêşketin û şiyarbûna welatparêzî û şoresgerî bigrin, dest bi êrîş û amadekirina planêñ taybetî kiribûn. Weke perçakî vê haziriyê û planêñ qirêjî, di 16-ê Çiriya Pêşîn ya 1970-yî de, hêzên dewletê bi berbanga sibê re digrin ser lokalêñ DDKO'ya Ankara û Stenbolê. Herweha di eynê roj û demê de li Ankara, Stenbol û Diyarbekirê digrin ser hinek malêñ endamêñ berpirsiyar yêñ DDKO'yê û gelek rewşenbir û welatparêzîñ Kurdan. Di vê operasyonê de, di gel hinek endam û berpirsiyarêñ DDKO, gelek rewşenbir û welatparêzîñ Kurd yêñ ku ne endamêñ van komelayan bûn jî digrin.

## Girtin û tewkîfkirin

Di vê operasyonê de, hêzên dewletê dest didin ser hemû dosyayêñ xebatê yêñ DDKO yê, fişen endaman, navnîşanêñ wan, meqbûzêñ peran û heta arşîva nîvîs û dengûbahsêñ rojnameyêñ rojane û hemû mase û kursiyêñ lokalêñ DDKO yê jî dişkinin. Li Diyarbekirê Tarik Ziya Ekinci, Canip Yıldırım û Yümnü Budak dixin bin çavan, ji wan Yümnü Budak berdidin, lê Canip Yıldırım û Tarik Ziya Ekinci tewkîf dikan. Wan tînin Ankarayê û li wê derê davêñ girtigehê. Di nav kesen ku hatibûn girtin de Musa Anter û M. Emin Bozarslan jî hebûn.

Li ser vê êrîşê, li Ankarayê DDKO û 17 rîexistinê pêşverû û şoresger civîneke hevbes amade dikan û belavokekê belav dikan.

Li Stenbolê jî DDKO û 8 rîexistinê şoreşger civîneke çapemeniyê çê dikin. Li hemberî vê berxwedan û reaksiyonê, piraniya girtiyan hatin berdan. Li ser itirazkirina awûkatan ji kesen ku hatibûn tewkîf kirin Canip Yıldırım, Tarik Ziya Ekinci, Musa Anter û M. Emin Bozarsalan ji hatin berdan; lê itiraza serokê DDKO yê Ankarayê İbrahim Güçlü, Sabri Çepik, Nezir Şemmiranlı û Mümtaz Kotan nehate pejirandin; wan avêtin girtigeha Ankarayê û zêdeyî pênc mehan, ew dernaxestin mahkemeyê.

## -V-

# Du bersiv û berevaniyê DDKO'yê yê dîrokî

**B**i hatina cuntaya 12-ê Adara 1970-yî Bîzîlm, zordarî û terora dewletê ya li ser gelê Kurd, welatparêz, pêşverû û şoreşgerên Kurd û Tirkan, tevgera neteweyî û şoresger ya Kurdistanê û tevgera pêşverû û çep ya Tirkîyê geleki dijwartir bûn. Bi awakî kîtlewî girtinan dest pê kirin. Endam û dîlxwazêñ DDKO û PDKT jî, ji van êrîşen hov û dijwar bêpar neman. Gelek endam û hevalbendêñ van rîexistinê û gelek welatparêzêñ Kurd jî bi îdeaya ku hatin girtin ew endamêñ van rîexistinê in zîlm, zoradarî, eş û işkenceyêñ mezin dîtin.

## Mahkemeya DDKO

Li gor ku Wedat Şadili dinivise, rewşenbir û welatparêzêñ Kurd yêñ ku ji doza DDKOyê de dihatin makemekirin ev bûn:

Fikret Şahin, Nusret Kılıçaslan, Mümtaz Kotan, Eyüp Sabri Çepik, Zeki Kaya, İhsan Yavuztûrk, İbrahim Güçlü, Yümnü Budak, Nezir Şemmiranlı, Faruk Aras, Ali Beyköylü, Isa Geçit, Ferit Uzun, Hasan Acar, Canip Yıldırım, Musa Anter, Mehmet Emin Bozarslan, İhsan Aksoy, Şakir Elçi, Ali Yılmaz Balkaş, Mahmut Kılıç, Battal Batte, Niyazi Dönmez, Zeruh Vakıfahmetoğlu, Mehmet Tüysüz, Sait Pektaş, Cimşid Bilek, Mahmut Fırat, Şehmus Aslan, İbrahim Halil Önen, Ahmet Zeki Okçuoğlu, Agah Uyanık, Tayyar Alaca, Nizamettin Bariş, Süleyman Atay, Fesih Şaşioğulları, Ömer Bakal, Eyyüp Alacabey, Mehmet Demir, Kemal Burkay, Mehmet Mehdi Zana, Ruşen Aslan, Edip Karahan, Yusuf Ekinci, Tahsin Ekinci, Zülküf Bilgin, Mehmet Naci Kutlay, Tarik Ziya Ekinci, Abdülhamit Karaçoç, Nazım Sönmez, Niyazi Tatlıci, Süleyman Çelik, Halit Aycicek, Abdurrahman Uçaman, Fikri Gürbüz Yıldızhan, Abdurrahman Dürre, Ferudun Yazgan, Vedat Erkaçmaz, Yusuf Kılıçer, Akif İskik, Bahri Evliyaoğlu, Mehmet Zeki Bozarslan, Fikri



Ji milê çepê İhsan Ozturk, Battal Battê, Hesen Oktem û Ferit Uzun di girtigeha Diyarbekirê de (Foto: Ji Battal Battê)

Müjdeci, Mehmet Sözer, Mehmet Gemici, Mustafa Düşünklî, Ömer Kan, Abdurrahman Demir, Mehmet Emin Tektaş, Ahmet Özdemir, İbrahim Erbatur, Mehmet Siddik Yıldız, Übeydullah Aydin, Sabri Yıldız, Ahmet Melik, Mehmet Nuri Sarmaşık, Kasım Kahraman, Mehmet Yıldız, Ferruh Kurtcebe Ozaner, Abdiüsselam Basutçu, Mehmet Şirin Baltaş, İrfan Bozgil, Ahmet Eren, Hikmet Basutçu, Necmettin Şad, Abdullah Begik, Ahmet Suat Yıldırım, İbrahim Babaoglu, Mehmet Emin Değer, Halil Bülbül, Abdulkadir Özışıklar, Nadir Yektaş (17).

Di îdeanameyêñ dadgirêñ kolonyalist yêñ dewleta Tirkîyê de, disa neteweyê Kurd dihate înkarkirin û ew weke Tirk dihate qebûlkirin. Yanî, siyaseta nîjâdperest ya dewletê careka din dihate dubare kirin. Dadgirêñ dewletê di vî warî de, siyaseta resmî ya şovenist weha dianîn zîmîn:

"Îro, heger em jî nêzîk ve li ser hûr bibin, wê ne rast be ku em zimanê komançî-Kurdî yê ku ew qas tevlihev û nayê fêm kirin, weke zimanê neteweyekîye biwesîfine. Zimanê Kurdî di eslê xwe de, ne zimanê neteweyekîku di dîrokê de heye. Ji xwe, êdî ev jî hatîye îspat kirin ku Kurd bi esl û feslê xwe ji nîjâda Tirkan têñ. Li gor ku zimanê eslî yê Tirkan tirkî ye, we gavêderdikeve holê ku zimanê hemnîjadê me Kurdan jî ji tirkî pê ve ne tu zimanekî din e. Weke ku beriya niha jî me gotibû, ev ziman di rastiya xwe de zimanekî taybetî ye ku ji civandina tirkî û pişti wê ji gelek zi-

manêñ milletêñ din pêkhatîye. Di enâmén lêkolînêñ zimannas û zanyarêñ sed-sala 20-an de derketiye holê ku bapîrêñ Tirkêñ me yêñ çiyayî Halti- Hororto di dema Asûran de bi zimanê tirkî dipeyivîn.

Di tu dema dîrokê de, li wilayetêñ me yêñ Rojhîlatê koçkirineke ku rûniştiyên îro weke pêmayî û ufare bihêlin çênebûye. Li ser rûyê dînyê, bi serê xwe nîjâdekî biyanî yê bi navê Kurd jî tuneye. Kurd ne hew hemwelatiyê me ne, herweha ew hemnîjadê me ne jî..." (18).

## Têbinî û çavkanî

(14) Dr. İbrahim Etem Gürsel, b.n.d, r. 96.

Tarîx, amadekar, hejmara besdaran û kesen ku di mitîngêñ Diyarbekir, Hîlwan, Varto, Swerek û Liceyê de axatin kirine, li gor agahdariyên îdeanameyâñ dadgirêñ doza DDKO hatine nîvisandin. Ji bo dirêjaya behsa van mitîngan binêre: DDKO Dava Dosyası, r. 32,33, 575,576,588. Dr. İbrahim Etem Gürsel, b.n.d, r. 96-99.

(15) Ji bona tevayiya vê raporê, binêre: DDKO Dava Dosyası, r. 597-603.

(16) Endamek ji komîteya karker ya di kongreya duyem ya DDKO ya Stenbolê de hatîye hilbijartin, nehate bîra hevalê Eyyüp Alacabey.


(17) Ji bo vê behsê, binêre: Vedat Şadilli, b.n.d, r. 279-288.

(18) Ji bo dirêjaya vê behsê, binêre: DDKO Dava Dosyası, r. 15-23.

Dûmahî heye

# PENCERE

Nezîh Ebû Efeş



## Neviyê çiyê, Fatih Mûderis

**R**ojekê ji rojan, dê cihekî wan, cihekî pir balkêş di hişê me de çêbibe, mebesta min cihê wan pêxwasan hêzdar, koçer û re-vend û cegerdar û mérxaşen çiyê ne. Çinkî beriya şest heftê salan şuna ji dayikbûna pêxemberê xweşik ê çiyan "Fatih Mûderis" destrîşankiribûn. Dê di asoyên xwe yên nediar de stêrkeke ciwan dalîqinîn: stêrka ku di pêşerojê de dê cihê wî yê li bin esmîn, nîşan bîke.

Lê - Ne wek Mecûsiyan - dê zêr û zîv pêşkêşî wî nekin, tenê, dê çarenusa ku Fatih Mûderis bike qezencarê nemirî û payedariyê diyarî wî bikin, nemir û payedarên ku li seranseri jiyana xwe ji dêvla me rahiştine xac u ji bo me; ji bo xweşikbûnê, bêzar û hejar dibin.

Pêxwas û rîbirrênu ku serê çiyan û şevistan û zilam li ber hêzdarî û stiranên xwe tewandibûn, dikaribûn -di kîlîka çirûsîna ronahiyeye nediar de helbestvanan û Xwedayan û pêxemberan biafirînin. Fatih Mûderis ji, ji sedised, pêxemberê wan bû, pêxemberekî hêjayî hêvî û ümidan e.

Fatih Mûderis li tenîta me ye. Bi êş; li renckêşana giyanen me temâse dike, li jêr zordesiya şermezar a pîrozmandiya xwe û tarîtiya zorbas a dema xwe, vêdikeve. Vêdikeve; ne wek wê mûma ku li perestgehê yan ji li koşeyeke nimêjê dihêle, na, lê wek kela ji ronahiyê ya di odaya xewa Xwedakî evînbaz de, bi ser bêdengî û lawaziyê de diçeme, wek giyanekî nefsbîcûk berz dibe. Dibêjim: Nefsbîcûk, çinkî xweş dizanim ku ev nefsbîcûk ya zilamekî hêjayî payedariyê ye. Ji ber ku hunermendê pîs-çinkî seviyeta pîsîtiya xwe dinase - xwe di parêze da ku hergav nefsbîcûk diyar bibe, lê li vir, nefsbîcûkiya wî dil de ye... çinkî ew nîşan e; nîşana cegerdariya giyan û aqil bi hev re ye: Ew mîrdewan e; mîrdewana lihevhatî û bilind a ku ber bi esman ve hildiperike.

Eger Fatih Mûderis yek ji pêxemberen me be - ji xwe bi rastî ji wilo ye - wî bi xwe tu carfî nameyeke an pirtûkeke nimêjê yan ji nexşeya ku cihê xwedê şanî me bike, pêşkêş me nekiriye.. Tenê xweşiya ku em dê çawan ji spehîbûnê hez bikin, çawan em dê nirx û buhayê spehîbûnê di vê tevliheviya ku giyanê gerdûn tar û mar dike, binasin, spehîtî bûyer e, dastan e, name ye. Spehîtî ji, çav û tilî û dilê Fatih Mûderis dîkin çav û tilî û dilê pêxemberekî, pêxemberê ku roja tu ji mîweyîn wî hez bikî, dê bêt.

Ji çel salî û vir de; ev cadûkarê payedar, berhemên giyanê xwe bi ser me de dirijîne, wek hunermendekî rastîn guh nade tu tişti ji bilî ku spehîbûn bi xwe pîrozmand be.

Anuha bi me re ye, li tenîta me ye, ISAYEKÎ nû hildiperike zingêring û xirecira xwe, bi dilsotinê û bi dilovanî û hêviye di ser dev re diçe.

ISAYEKÎ nû...

Bê gazin hildiperike xaçê xwe mîna ku hilperike werîsê ronahiyê. ISAYEKÎ nû.. Tirsa min ew e ku rojekê bi koteke em berê xwe bidin behîstê çinkî em evîndar û dildarênu Fatih Mûderis in.

Wergêr: Ehmed Huseynî

# weşanêñ nû ▶ weşanêñ nû

## "Pirsa Kurdî di Rojhilata Navîn de"

Ji Dr. Hamid Isa

E vî kitêb ku dewama doktorayeke lêkolînê ye ji Ealiyê Hamid Mehmûd Isa ve li Unîversiteya 'Eyn Şems hatiye nivîsin. Ev berhem li ser dîroka têkoşîn û serhîdanê Kurdan ên vê sedsala dawî bi zimanê Erebî hatiye nivîsin. Nivîskar ji destpêka şerê yekemîn ê cihanê yanî ji destpêka salên 1900'î û vir ve rewşa Kurdan û tekosîna wan a ji bo azadî û serbixwebûnê ku li gorî wî tê de nişanê neteweyî ên hevdem têne dîtin, digre destê xwe û pê ve tê heyanî salên 1991'ê, pişti dawiya cenga Xelîcê (Kendava) Faris, yan ji pişti serîhildina Kurdan başûrê Kurdistanê.

Hamid Isa di vê pirtûka xwe de rewşa Kurden herçar besan, rewşa bizav û tevgerê neteweyî li van herêman, rewşa Kurden Sovyeta kevn, tevger û xebata navnetewî ji bo doza Kurdi û siyaseta dewlet û welatên cihanê li ser pirsa Kurdi, raxistîye berçavên xwendevanê Erebî.

Ji bilî tevger û xebata Kurden a siyasi û tekosîna wan a leşkerî, nivîskarî rewşa wan a civakî, aborî,

çandî û hejmara nifûsa wan ji di destpêka pirtûkê de diyar kiriye. Di berhemê de gellek çavkaniyê hêja ku agahdarî ji wan hatine girtin hene lê pirr mixabin ku di zahfîn wan de navê weşanxane û cih û de-ma weşandinê nehatiye nivîsin ku bêguman dibe kîmasiyek ji bo vê kitêba hêja.

Kitêb di nav weşanêñ "mektebe Medbûlî" de sala 1992'an de li Qahîreyê çap bûye. Mixabin ku li ser jiyana nivîskarê kitêbê û li ser berhemê wî yên din agahdariyê piçûk ku em karibin bidin xwendevanê xwe nînin, lê li gor ku ji sernameya kitêbê tê zanîn ew li Misrê jiyye, li wir di Unîversiteya 'Eyn Şems de li Fakulteya Edebiyatê beşa Dîrokê xwendeviye û li wir li ser pirsa Kurden doktora ya xwe daye.

## "Kurdistan di Nav Pêlên Dîrokê de"

Ji Xusro Goranî

E vî berhema hêja ya Xusro Goranî bi Erebî ye û li gor pêşgotina wî ew ji sê cildan pêk hatiye. Cildê pêşî ku bi tenê ew ketiye destê min li ser rewşa Kuridstanê û der û dorêne wê ye. Dema berî dîrokê ya kevnare yanî ji 10000'ê berî Isa dest pê dike heyanî 400'ê pişti Isa digire. Ew bi awayekî fireh li ser wan gel û qebileyê cihê cihê ku hatine li herêmê cîwar bûne, li wir jiyane yan ji desthilatdarî kirine û mora xwe li dîroka wê deverê xistine radiweste. Nivîskar pêl bi pêl besen mîjûyê digire destê xwe û rewşa wan gelên wir di wê demê de bi nav û nîşan dike û tîne pêş çavên xwendevanê Erebî. Di kitêbê de nîv rûpel ji nivîseke Avesta ji wek nimûne hatiye girtin. Di dawiya pirtûkê de hinek jê-renot li ser navê cih û gelan û li ser hin termê din hatine nivîsin. Di pey de ji agahdarî li ser rewşa Kurden û Kurdistanê, parêvekirina wê, rewşa gelheyê (nîfîsa) Kurden di nav welatên dagirker de û sîno-re Kurdistanê ji hatine dayin. Di dawiya berhemê

de ji grubêñ zimanê cihanê û peywendiyê wan hatine nivîsan-din.

Xusro Goranî di sala 1960'î de li başûrê Kudistanê li qesabeya Nînewa ya Berderesê çêbûye, ew di sala 1978'an de gîhiştiye tevgera rizgarîxwaz a Kurdi û piştre di sala 1980'î de ji bo temamkirina xwendina xwe derbasî Swêdê bûye. Di sala 1988'an de diplomaya xwe ya karê xebat û aboriya neteweyî sitandiye û piştre çend kurs ji li ser aboriya şirketan xwendeviye. Di navbera salên 1988 û 1992'yan de li eyîn unîversiteyê bi dîrokê ve mijûl bûye û li ser xebitiye.

Pirtûk di sala 1992'an de li Stokholmê hatiye çap kirin lê mixabin ku navê weşanxaneyê tê de tune.

## "Into Kurdistan Frontiers Under Fire"

Ji Sheri Laizer

Pirtûka Into Kurdistan Frontiers Under Fire (Li Kurdistanê Sînorê Bin Agir) ji aliye Sheri Laizer ve bi Ingilîzi hatiye nivîsin û di sala 1991'ê de bi sernameyeke kurt ji Peter Gabriel û bi pêşgotina dosta Kurden Helga Graham li New Jersey, USA hatiye çapkirin. Sheri Laizer ji tecrubeyen xwe yê şexsî rewşa wê herêma Turkiyeyê ku nêzî 8-10 milion Kurd lê dijîn dizane ku hebûna yek bandek ji kilamên Kurdi bi merivekî re li Turkiyeyê dibe sedemê razana 6 mehan yan ji zêdetir di heps û zindanan de.

Ew di gerra xwe de rastî coşa pîreke Kurd tê ku cara pêşî televizyonê dibîne û li İstanbulê ji ew konsera dengbêjekî xwedê ne giravî Kurd dibîne û disa dibîne ku Kurd ji beşdarî şahiya pîrozbaşıya serkeftina Komara Turkiyeyê ya diji emperialistên Ewrûpa dibin.


Berhem bi xwe bi bakurê Kurdistanê dest pê dike û beşa pêşî ji bi navê "Herêma Derebegi ji Navçeya Qedexekirî" ye. Ya 2'yan li ser rîbirî, tembûrvanî, dengbêj û polşen xeffi (MITê) ye. Piştre ew derbasî ser jiyana gel a civakî dibe û qala bûyer û gotinê li ser cinn û çavlîdanê (nezerê) dike. Herweha ew tê de dîtinê xwe li ser filmê Yol (Rê) û filmçekerê qe-

dirşînas Yilmaz Güney ji dibêje. Ew karê jinan, rewşa jin û gundêñ Kurden ên li çiyan û kilam û baciyê Kurdi yêvînî ji bi awayekî fireh pêşkêşî xwendevanê xwe dike. Ew durûtiya wan ronakbîrên Kurd ku ketine nav der û dorêne kultura Tirkî û jî nasnameya Kurdi dûr ketine û wê napejirînin dibîne û tîne pêş çavên xwendevanen.

Laizer di berhema xwe de li ser rewşa Kurden perçeyen din ji rawestiyaye, li gellek herêm û bajareñ Kurdistanê geriyaye, di nav wan de jiyaye û wan tişten ku bi xwe dîtiye nivîsandiye.

Sheri Laizer nivîser û lêkolînerê ser filman e ku di nav berhemê wê yê weşandî de bûyerên qewimî, helbest û wêne ji hene. Herweha ew di nav Îndustriya müsikê de ji xebitiye û li artisten Kurden xwedî derketiye.

Amadekar: Emin Narozi



# Newroza te pîroz be

Di navbera mizgîniyên êgir û ewrênu di tîna bendemanê de xemgîniyê dîbarîn, di wê navbera bê navber de. pêtên te hildiperikin tavşorka çiyayênu ku di sosret û talanan de diramin. Buhar te ji serî de birîndar e, li ser devê rê, rêça bê veger, kulîkîn hovane yên hinarkîn Helepçeyê desten xwe li rûpelên demê radipelînin û dengê kîlîkîn matmayî ji sawa axê derdi.

Ji ber ku termê xewna te yî kovandar, dengê azadiya yî keserkûr di sawîra birc û kelehen serhişkiya kevnar de, bê xwedî û ser bi xwelî mane

Ji ber ku hespên te di cirîda peymanen pûçbûyi de serberdayî, bê cî mane

Ji ber ku ji sûlavêن bînçîkyayî yên Sersingê hetanî gerdeniya bê morîk mayî ya Botan, ji şînîgiriya Mehabadê hetanî qebqeba ne ji dil a kewn,

ji toza sergerm a Amûda şewatan hetanî bêzariya paytextan, hetanî Stokholma ku dê bibe goristanâ xewrevîniya mişextan, di mehrecana rûreşıya "Welat-kujîyê" de bê serî mane

Ji ber ku sirûd û heyran, lawik û dîlan

li ber destê çavşor û zikreşan sêwî mane

Ji ber ku kerî xemgîn e

Ji ber ku girî çarîn e

Ji ber ku mirî bêzar in

Ji ber ku zindî bê par in

Ji ber ku nasname bi agirê me dişewite

Ji ber ku esman bi tîna ezîtiya me me diperpite

Ji ber ku kenê me di landikê de hatiye kuştin

Ji ber ku çermê me li ser komera bêrûmetiyê hatiye biraştin

Ji ber ku pêşmergeyên te kirine merge

Ji ber ku çiyayênu te hiştine bê pencere û dergeh

Ji ber ku te kirine pirseke bê kok û reh

Ji ber ku wicdan wêran bûye

Ji ber ku rastî talan bûye

Ji ber ku xwîna şehîdan arzan bûye

Ji ber ku pêlén axînê bê kenar in

Ji ber ku daristanê çavê te bê çinar in

Ji ber ku dastan zuha dibin

Ji ber ku siwar û xweşmîr buha dibin

Ji ber ku nexşeya te ji ber ronahîyê direve

Ji ber ku ala te di jana rengan dilive

Ji ber ku lerza me ji bejna çiyê hatiye vegetandin

Ji ber ku destmala dayika me bi bêbextî hatiye revandin

Ji ber ku keştiya me bê av û bê melevan e

Ji ber ku peyva me peyva zimanekî xav e

Ji ber ku te zimanê şevê li ber me dirêjtir kir

Ji ber ku te rûreşıya ebedî ya dîrokê rûreştit kir

Ji ber ku te zixta çavlîremanê di hişê hingûrê de geşter kir

ji ber ku te keysa gîryanê di reşçavên êvarê de xweştit kir

Ji ber ku te seqema şevê tarawgehê

Tenhatî û reşdiwarên girtîgehê

di hinavênu me de diçandin

Ji ber ku te ken û bişîrîn û aheng

Bi hezaran xoşewist û zilam û leheng

Bêrîvan û zerî û çeleng

ji ber hilma me direvandin

Ji ber ku te xencera xwe yî jehrewî di gurçika me de çikandiye

Ji ber ku te babelîska temenê me di qırçeqirça parsûyên sînga xwe de hilandiye

Ji ber ku te gernameya van rîçen mirintijî li ber şemala gerdena

xwe tewandiye

Newroza te pîroz be!

# Newroz bû cejna şehîdan...

Destpêka biharê bû, gil û giya bi rengê xwe yê kesk ji erdê bihostek kişiyabû. Gul û beybûn û sosin, sunbul û rihanan serên xwe di nav dehl û zeviyan de derxistibûn, ji xwezayê re dibişkivîn. Jiyan, ji reng û şewqa wan ra a ku dabû ser tebîetê devvekirî û heyran mabû. Bayê biharê, kulîkîn rengîn xis-tibûn sohbetekê şerîn. Bihar bû êdî, Newroz bû; cejna xweristê...

Cih û war li kevirên hûr û gir, li taht û latan teng bûbûn. Suruçte bi biharê re jiyanek teze, yeke têr û tijî girtibû; hêşinahîyê ji her hêlê ve zor dida dora xwe û ji nav axê dipiqî, xwe li dora lat û beran dialand, hawîrdor li wan teng dikir.

Dar û beran, kulîkîn rengîn pêşkêşî çavên evîndaran dikirin; der û dora xwe mîna bihiştê dixemîlandî. Şalûl û bilbil, bi dengê xwe yê zîz li ser destpêka biharê û hatîna Newrozê bi eşq û evîn distiran. Sorgul û binefîş bi dengê wan jar û mest dibûn, li gora stranan reng diguhertin, geh şîn û geh jî sor, carna jî mîna Cembeliyê Binefşa Narîn piçûk û mezin dibûn.

Quntara çiyê bi destpêka biharê û derketina tavê re reşbelek bûbû. Berf û qeşem ji ber tava biharê diheliyan û avê hêdî hêdî xwe ber bi guhar û newalan ve berdida. Newalên kûr i bêserî û bêbînî ji ber ava xwezayê dîn û har bûbûn. Li serê hindefen wan newalan cur be cur ber û fêkiyên xwezayê hebhûna xwe pêşkêşî mirovatîyê dikirin.

Bihar bû êdî, Newroz bû; cejna jiyanê...

Sivanê Kurd pezê xwe li ber quntara çiyê berdabû çêrê û bi dengê bilûra xwe jî hawîrdor şen dikir. Berxên nûzayî li dora şîven kom bûbûn û bêdeng guhdarîya wî dikirin. Pezkovî û xezalên, delal xwe ji çiyê berdabûn û ji newalên kûr hilkiyabûn daku li wê bilûra bi şewat bihisin. Ji dûr ve mîna peykeran, bêhis ew guhdar dikirin. Çivîkên rengîn ji rojhîlat û rojava firiyabûn û li ser dara ku şîven pal dabûyê danibûn; li gor dengê bilûre çîkeçik dikirin.

Gelê bajêr xwe ji bo Newrozê amade dikir. Zarokên piçûk û mezin, cilên rengîn li xwe dikirin, qîzên xama, bi sipehîtiya xwe, bi kil û kildanên xwe, bi cil û fîstanên xwe yên neteweyî xorten gîhîşti ji hiş dibirin. Xorten ciwan bi dengê xwe yê zîz, kilamên evînê digitin û li ser evîna xwe bacîyan diafirandin. Şagîrfan li ser dîroka Newrozê şanoyen müzikalî amade dikirin. Dê û bav bi hêviyên rizgarî û azadiyê bi kîf û eşq li keç û lawên xwe temaşe dikirin, silav didan jiyanek nû ya pîroz. Gel li hev dixij-vijî, bi kîf diçû û dihat.

Edî bihar bû, Newroz, cejna evînê, hatibû...

Neteweyê Kurd, li deşt û çolan, li ser zinar û çiyan, li bakur û li başûr, li rojhîlat û li rojava xwe amadeyi cejna xwe ya neteweyî dikir. Kurd bi kîf û eşq dikişyan kolanan; ji bêbextî û xayıntiyê bêxeber...

Ji nişka ve esman, mîna teyrîn har ji balafîrên dijmin tije bû. Pêşî ew bilindbûn, hino hino xwe berdan xwarê û nîzîm bûn, nîzîm bûn... Gel nedireviya, Newroz bû çawa! Belkî ew jî hatibûn pîroziyê! Nîzîm bûn, nîzîm bûn û boom! Herkes reviya, hinek ketin malen xwe, hinek li tirimbilan siwar bûn ku birevin û hinek jî li ortê mabûn.

Carek din hatin xwe berdan xwarê; nîzîm bûn, nîzîm bûn û boom! Booom! Booom!... Piş re deng hat birrîn; ne his û ne deng, ne axîn û ne oxîn. Toz û dûman ji erdê ji nav ba-




jîr bi jor ve hilkiya. Herder şewitibû, herkesi ji bombeyan para xwe girtibû. Pênc hezar can, pênc hezar kal, jîn û zarok...

Hêlinê û Aryan li cem kalikê xwe, li gund mîvan bûn. Çaxê vegeleyan bajêr, ne bajar ma-bû ne jî mala wan. Dûman ji nav bajêr dikişya; hê ji tesîra çekên kîmyayî mabû. Li dora xwe nîhîrîn û li nav kavilan geriyan. Geriyan û geriyan... Dê, bi ser birayê piçûk Şoreş ve dirêjkirî, ew himêz kiribû. Bav di tirimbîlê de, teví zarokên din rûnişti sekinibû. Bê deng û bê pêjin...

Hêlinê û Aryanî li hev nîhîrîn, desten xwe da-nîn ser dev û pozên xwe û li çiyê xwe rûniştin, pal dan dîwarê wêrankirî. Bêdengî bi çipeçipa dilopên çavan xera bû. Pênc hezar can, pênc hezar Kurd...

Bihar bû êdî, Newroz bû; cejna şehîdan...

# NAMÎ piştî 20 salan zindî dibe



Mele Ehmedê Namî (1906-1975)

## Rezo Osê

**Samî:** "Bi vê bîranînê jî Namî , di demê de zindî dibe.. Zindikirina wî jî di riya çalakiyên rewşenbîrên Kurd re yên ku Namî yek ji wan bû, rû dide. Erê, berî ku M.E. Namî ristevan be, nunerê rewşenbîriya Kurdi bû, nivîskarê kovarê Ronahî û Hawarê bû. Lewra ez xwe şad û bextiyar dibînim ku rewşenbîrên Kurd, xwendevanê Kurdi û nivîskarê wan barê vê bîranînê hilgirtin û ev şev li dar xistin.."

**D**i 11.12.1995 an de, li bajarê Qamışlo, şeveke rewşenbîrî hate lidarxistin. Ev şev di bîranîna bîst-saliya mirina mele Ehmedê Namî de pêk hat. Pêkhatina wê jî kar û barê rewşenbîran bû, û bi hiş û hunerên wan hate neqisandin.

Bêhtir ji 150 mîr û jinêñ Kurd, di vê şevê de, di bin navnîşana "Bila bîranîna Namî bibe simbola rewşenbîriye" li hev civiyan. Rêvebirina şevê jî barê Ferhadê Çelebi û Tengezârê Marînî bû. Programa şevê bi gotin, helbest, lêkolîn û pêşniyaran têr bû. Di dema lihevkom'bûnê de, Namî bi dengê xwe yê melûl mîvanen şevê dixistin rewşeke bêdengî. Rewanpakê Mihemed Şêxo jî bi awazên xwe sirûdên Namî, bi ser mîvanan de diwerandin.

Şeva bîranîna Namî bi sipasiya kurê wî Samî kete çerxa xwe û li dora zîlana ger-dûna rewşenbîriya Namî, hêdî hêdî, zîvirî. Di gotina xwe de Samî got: " Bi vê bîranînê jî Namî , di demê de zindî dibe.. Zindikirina wî jî di riya çalakiyên rewşenbîrên Kurd re yên ku Namî yek ji wan bû, rû dije. Erê, berî ku M.E. Namî ristevan be, ûnerê rewşenbîriya Kurdi bû, nivîskarê ovarê Ronahî û Hawarê bû. Lewra ez ve şad û bextiyar dibînim ku rewşenbîren Kurd, xwendevanê Kurdi û nivîskarê wan barê vê bîranînê hilgirtin û ev şev li dar xistin.."

Piştî vê yekê rewşenbîrên şevê gotin i partin neviya Namî, da li ser kurtejiyana kalikê xwe raweste. Hinga, Nîgara Namî dest bi kurtejiyana baypîrê xwe kir, got;


"Namî destnîvisek bi navê 'Çiko li bîr im' li şûn xwe hiştiye. Gelek bîranînen xwe di vê destnîvîse de diraxe. Wilo jî li ser kurtejiyana xwe radiweste. Tê de dibêje: "Di sala 1906'an de, heyva Gulanê li Gundê Erbetê hatim dînyayê. Pênc pêhesiyen min li wî gundi agahdar bûne. Anglo bi bîna gul û sosinan, bi dengê şalûl û bilbilan, bi dîstina roja jîndar, bi hingivti-na(destana) ebrê dayikeke Kurdi û tamki-



Seydayê Tirêj



Keça Kurd



Rezo Osê

rîna şîrê bustanê wê dayikê tamdar bûne. Paşê, ez bi dergûşke darî jî darêñ ciyayê Kurdistanê li ser erd û di bin ezmanê wê de, bi destekî Kurdi, hatime hejandin.... di himbêza dê û bavê dilovan de, bi delalî hatime xwedîkirin..."

M.E.Namî li gundê Tilşîrê cih digre û dest bi jiyana xwe ya civakî, torevanî û kurdevarî dike. Rola rewşenbîrekî Kurd bi giranî, di dema xwe de, dileyize. Têkiliyên rewşenbîrî bi kovarê Ronahî û Hawarê re girê dide. Dibe yek ji dostêñ nêzîk ji rewşenbîren dema xwe re û di navwan de mîrê rewşenbîriya Kurî di sedsala 20'an de- Mîr Celadet Bedirxan, wilo jî dikeve kom û komeleyen Kurdevarîye "

Edî dor gihaşt seydayê Tirêj, da dergehê beşê hunerî veke û bi helbestekê derbasî gulzara Namî bibe. Helbesta xwe bi sernavê "Bîranîna Seydayê Namî" pêşkêsi kesen şevê dike û gaziya xwe dighîne Namî, got:

*Dem û dewra te ya Seyda, tu bigrî xam  
[û defter]  
Bidî ber şîrr û helbestan, li meydânê  
[her û wer]  
Çi bêjîm ez gelek heyfa min tê li xwîna  
[ciwanan]  
Hazar ax û keser Seyda, ji destê wan ne  
[zanan]*

Seydayê Tirêj, bi vê germiyê, sê helbest xwendin. Belê, bê çawa gaziya xwe gîhand Namî di bîranîna bîtsaliya wî de, wilo jî gaziya xwe gîhand Xanî di bîranîna 300 saliya Mem û Zina wî de... Bihna xwe berda û rî ji xwedîgotinan re vekir. Hinga rêvebirîn şevê gotin şiyandin kovara El-Museqqef El- Teqeddûmî, da berpir-

siyarê wê gotina xwe bi Erebî pêşkêş bike. Kovar li ser çend çik û cirawîskên jîyan û nivîsandinêñ Namî radiwestiya. Tê gotin, ku "...Hozanê me, yê gewre M.E.Namî yek ji wan rewşenbîran e ku li zengilê şiyarî û xwenasiyê dan û beraberî vedana gelîti û jariyê radiwestan. Wilo jî doza xwendin û zanînê, weku baştırin rî ji bo azadî û serfiraziyê, kirin..."

Gava Dildarê Mîdî bi wê bejna ziravrabû, kurte pist ket nav besdârên şevê û çavnehêriya lebt û liva hozanê ciwan kirin. D. Mîdî jî hêviyên wan bi cih anî û helbestek bi navê "Bersiva Seydayê Keleş" pêşkêş kir. Belê, Seydayê Keleş di helbesteke xwe de, li ser jarî, belengazî û mestiya gelê Kurd diraweste. D. Mîdî jî helbesta xwe diyarî Seydayê Keleş dike û bersiva wî dide, dibêje:

*Seyda, li te mîzgînî ku em dara berû ne  
Bahoz li me dide û em ji cih ne legandin  
Qurmê me ji rengê sekikan çû ye di xakê  
Lewra, evî bayî ji me yek şax nehejandin*

Wilo, dor gihişt kovara El-Hîwar. Berpirsiyare wê gotina xwe bi nermî xwend. Tê de erkêñ rewşenbîrî berçav kir û hêvî kir ku bîranîna Namî bibe jêdara karêñ hêja di warê pêşvebirina toreyâ Kurdi de ku bibe potansiyalek ji rewşenbîren Kurd re, da erkêñ xwe bi delalî û têgîhiştin bide pêş, da karibe bibe cihê baweriyyê di cîvaka xwe de û desthilatê vekirin û birêvebirina danûstendineke Kurdi-Kurdi û Kurdi-Erebî be.

Rêvebirîn şevê anîn bîra mîvanan, ku "Namî piştigirekî xurt bû ji pîrekan re", da bi van gotinan rî bidin keça Kurd.

Keça Kurd jî dest bi gotara xwe "Hinek

bîranînê min di gel Namî" kir. Di gotara xwe de, bi rewanî li ser reng û şeweyen kevnecivatêñ Kurdevarê dema Namî râwestiya, da di dawiyê de hin pêşniyaren hêja, di warê pêşketineke rewşenbîrî de, berçav bike.

Vê carê berpirsiyare kovara Zanîn gotarek bi navê "Şivanê derdan" xwend. Ev gotar di rengê lêkolîneke bîbiliyografi de pêşkêş bû. Tê de li ser berhemêñ Namî û nivîsandinêñ ku li ser wî hatine weşandîdihat radiwestan. Di dawiyê de helbesta Namî ya bi navê "Diljaniya Haco" xwend. Di vê helbestê de Namî xwe bi "Şivanê derdan" pesin dide.

Wilô, berbirsiyare kovara Zanîn gotara xwe bi germî bi dawî anî, da rêvebirîn şevê helbestvanê bi lept û liv, Salihê Heydo, bînin ser zimêñ. Edî S. Heydo bi wê enerjiya xwe şevê germtir kir, gava du helbest li pey hev pêşkêş dikirin û hişt ku kesen şevê tev bi malika dawî re bikenin.

Piştî vê vehesandina bi S. Heydo re, gotin gihaşt kovara Pirsê. Berpirsiyare kovare jî gotinek li ser war û qonaxêñ rewşenbîriya Kurdi xwend. Kêfxweşîya xwe diyar kir ku "Bîranîna Seydayê Namî bû sedema karekî hevbeş ên kovaran. bi hevre..." Û fersenda xwe dît ku wan pêşniyaren kovare, yên ku di şeva "Rojnameya Kurdi" de hatî berbiçavkirin careke din bîne zimêñ.

Berpirsiyare kovara Pirsê gotina xwe bi dawî anî, da Mehfûz nîrînekê bi şeweyê gotareke rojnamevanî li ser rewşa nivîsandinêñ Kurdi û nivîskarê dema iro pêşkêş bike. Mehfûz, di gotara xwe de li ser pileya nîzîm di zanîna hin nivîskarê xwedîçap de radiweste û mixabiniya xwe diyar dîke ku çapemeniya Kurdi bê kontroleke

rewşenbirî bi rê ve diçê. Lewra şâşiyên bê ser û ber di warê ziman, rêziman û hevoka Kurdî de peyda dibin. Di dawiya gotara xwe de Mehfûz çend pêşniyar di vî warî de, anî zimên.

Piştî vê lêkolînê gotin gihaşt kovara Gulistanê, da berpirssiyarê wê gotineke ne ni-vîsandî bêje. Di vê kurtegotina xwe de li ser giraniya şevê rawestiya û doza pêkanîna atmosfereke rewşenbirî kir.

Piştî kurtegotina kovara Gulistanê bû meydana Seydayê Keleş da helbestekê bi navê "Namî" bixwîne. S. Keleş banga xwe gihad Namî, got;

*Namî, te ji nameya xwe da me  
Bi pêş ve dida te hunera me  
Îşev te di bîra xwe de tînin  
Rewşen te dida her devara me*

Seydayê Keleş bi vê rewaniyê berdewam kir, tanî gihaşt.

*Lêdan û bi kuştin em diçin hev  
Dijmin vemirand find û çira me*

Hinga serê xwe ber bi mîvanên şevê de rakir û got; "Ez bi rengekî real li pirs û rewşa Kurdî dinêrim, ne weke D. Mîdî..." û helbesta xwe. Piştî vejiyanekî diyar, berdewam kir tanî bi dawî anî.

Wilo, rêvebirêş şevê navê Rezo anî zimên, da lêkolînêkî li ser pirtûka Namî "Agirê Sînema Amûdê" pêşkêş bike.

Rezo got: "Ev gotar di sala 1989'an de di kovara Stêr hej. 15'an de bi navê Aro, hatiye weşandin. Sernavê vê lêkolînê jî "Buyerek ji dîroka wenda" ye. Ew bi xwe xwendineke ji pirtûka Namî "Agirê Sînema Amûdê" re ye. Ev agirê ku zimanên xwe avêtin gul û kulîkîn her malê. ew agirê ku bi şûn xwe debihna bîraştina goşte zarokên Kurd, wekû agirê Eleqemşê, di nav rûpelên dîrokê de hişt..."

Piştî ku Rezo bi firehî li ser naveroka pirtûka Namî rawestiya û lêkolîna xwe bi dawî anî, dor gîha Tengazerê Marînî, da şevê bi helbesteke nûjen, bi dawî bîne. Helbesta xwe "Mij" jî diyarî giyanê Namî kir.

Tê de got;

*Servaniyo  
Şûré ji tîrêjén rojê  
kete kalanê ewrên ziviztanê  
Tê de nûsi.  
Sîrûdên pêkanînê ne  
De lêxe, lêxe...  
Siwaro  
pîlpolikên gemkir  
di şûna simên hespê te de  
pîkol dîkin..*

*Hozano  
Çitikên nîvîsandinê, di destêñ kop de  
li ser rûpelên tarî...  
dîkin ziqe ziq  
aramiya xewê ji çavêñ  
sira bayê sibehê  
direvînin.*

*De bêje dengbêjo, bêje..  
Ji strana xwe sil nebe  
Bila stûnên jor bîhingirin.  
Bila...*

*Li ser xemleysiya şevê  
em bîmînîn pîrseke vekirî...*

Ü T. Marînî pirsa xwe ji besar û amedevanên şevê re vekirî hişt.

Piştî vê yekê Ferhadê Çelebî li ser navê kovarêñ Kurdî, sipasiya mîvanên şeva Namî kir û şev kut kir. □

# Pîroznameya Newrozê

Xwişk û birayan  
Şevén we roj bin  
Û rojên we cejin bin  
Û cejnên we bi şadî  
Û xweşî û kamîranî bin.  
Birayên hêja û dilovan  
Bi van çend xwoşwanê jêrî  
Cejna we û welat pîroz dikim...

Hersal vî çaxî,cejna we pîroz  
Cejna welat e, şadîman newroz

Bi hezara sal, "Kawayê" hinermend  
Kirine adet, ev reqs û govend

Sala hezar û neh sed û heftê  
Banga serxwebûn, zor bi min xweş tê

Deh û yek adar,cejna azadî  
Bîst û yekê wê, newroz û şadî

Bi xêr bê bihar, newroz û adar  
Xweş dibe bi wan dilêñ evîndar

Agirê newroz li "Girê Yara"  
Hilbû bi şadî mangê adara

Meyze ke îro, li guhê Laleş  
Rûdêmê keçan, mîna gula geş

Qîz û xortêñ kurd, çeleng û çak in  
Bi awaz û deng, wa tim dibakin

Zengilê jînê- newroz, vaye hat  
Mujde be welat roja te hilat

Pêşmergê nebez, dara azadî  
Av da bi xwînê, bi şad û merdî

Spas û pesin, herdem ji bo wan  
Xwîna xwe rihtin li boyî jiyan

Xweşî li deşt û zozan û sûka  
Xweşî li kala, xweşî li bûka  
Xweşî li zaxa, xweşî li bilbil  
Xweşî li baxa, xweşî li sorgul

Xweşî li guhê Pêşder û Hemrîn  
Xweşî li pîrê-Megrûn û Sefîn

Bigirî ji Sîwas, ta bi Xaneqîn  
Welatê me ye nûber û şêrin-

Deşt û newal û çiya û zozan  
Buhişa "îrem", bijî Kurdistan

Kangeha Dicle, serkana Firat  
Meyze ke Cûdî, paşî Ararat

Jor û jêrê wê, tev bax û bostan  
Nabî mîna wê, Siwîs û Libnan

Kanî Gelale, ka Hacî-Umran  
Mehbetus-selam, cîgahê şêran

Bijî yekîti, her bijî xebat  
Bijî Partiya Kurdên demoqrat

Bijî pêşmerge, bijîn fedakar  
Bijî şoreşa Şêrên namîdar

Pêşmerge bijî bi serfirazî  
Lawanê Welat, şehîd û xazî

Bijî Mistefa bi navê Xanî  
Qehremanê Kurd bijî Berzanî


Şoreşa te bû, deng da li cîhan  
Lew tiwî îro, serok û rîzan

Her bijî, bijî şoreşgêrê Kurd  
Jîndar bû bi te, nav û namê Kurd

Bi hev re bêjin, xwişk û birayan  
Bijî bi şadî, Kurd û Kurdistan

Hersal vî çaxî,cejna we pîroz  
Cejna welatê-şadîman newroz

**Mele Ehmedê Namî**



Mahmûd  
LEWENDÎ

# Beroş



## Etîmolojîya hin gotinê mîtolojîk ên Kurdi

**Berhîm:** Gotineke xwerû kurdî ye. Ji du gotinan pêk tê: Ber+Hîm, yanê yê ku li ber hîm/esas/bingeh/temel rûniştiye an jî rawestiyaye.

Îcar wexta ku meriv BERHÎM bi herfîn erebî binivîse tenê bi herfîn bêdeng “BRHM” tê nivîsin. Vêca ev jî bi awayê “Brahîm, Ebrahîm, Îbrahîm, Birahîm” tê xwendin. Ji ber wê jî ereban jî li gor xwe xwendine û di nav tarîtiya tarîxê de çûye bûye malê wan.

**Paraşut:** Ev jî gotineke kurdî ye ku qet ne ciyê munaqeşeyê ye. Paraşut ji “PER û ŞÜTIKÎN”ê pêk hatiye. Yanê mirov bi per dişütike ser ruyê erdê. Îcar Awrûpî nuha wexta ku xwe ji tiyareyê davêjin, bi potikên wek hevrîsim xwe dişütikînin ser ruyê erdê. Û ji wan potikên xwe re jî dibêjin Paraşut. Û ev gotin jî ji me dizîne û kirine malê xwe. Ji xwe malê bêxwedî her tim talan dibe. Her çendî di ferhengên wan de maneya vê gotinê nivîsîne ku “para”: li dij, “şut”: ketin, yanê li dij ketinê. Lî bi a min ji ber xwe ve davêjin.

**Daktilo:** Ji xwe pîrika min jî dizane ku xwerû kurdî ye. Hema qet îzahet jê re ne lazim e. Daktilo ji du gotinê gelek de kevn ên kurdî pêk hatine; text û tilî. Di dewra berê berê de kurdan wexta ku nuh daktilo îcad kîn ji text bû. Îcar bi tilîyan li vî textî dixistin, li gor dengê tilîyan yê li hember jê fêm dikirin. Û wê demê ji vê makîna textîna îptîdaî re digotin textîlo (text-tilî).

text-tilî.....text-tîlo.....tex-tîlo.....deqt-tîlo.....dakt-tîlo....daktilo

Di vî warî de hin zanayê din yêndi kurdan hene ku ji min cihê difikirin. Ew jî dibêjin ku ji “deqa tilî” hatiye.

### Adem û Hewa

Hewa:

-Adem tu ji min hez dikî, ne?

Adem:


-Ma bêyî te kî heye ku!?



wan. b)Qewmek ku tê gotin Kurd bûne.

### Serejêr

1-a) Cejna me ya netewî. b)Qehremanê Newrozê. 2-a)Daçek (berepaş). b)Termometreyan de bi kar tê. 3-Agir. 4-a) Sor yek ji wan e. b)Pro-navek. c)Padışah, qiral. 5-a)Navekî keçan (berevajî). b)Tevlihev, zehmet. 6-a)Kurtiya numreyê. b)Bûket: 7-a)Paşnavê qehremanê Kurd ê ku xâçperest ji Qudsê derêxistin. b)Bi Dîmilî (Zazakî) û Soranî av. 8-a)Pê-xemberek (berepaş). b)Peyveke ecêbmayinê (berepaş). c)Di matematikê de işaretek. 9-Paşnavê nivîskarê pirtûka “Agirê Sinema Amûdê” (berevajî). b)Navekî lawan. 10-a)Rojnamek Kurdan a hefteyî. b)Vî alî wî alî (berevajî). 11-a)beşek jî xêni (berevajî). b)Tav, roj. 12-a) Navekî la-



### Bêkarêñ hemû welatan dev ji kar berdin!



### Dev jê berdaye

-Xêra xwe hela cixareyekê bide min lo.

-Wîm, min got qey te dev jê berdaye?

-Na welle min dev ji kîrîna ci-xarê berdaye, lê pêşde ezê dev ji kîşandina wê jî berdim!

Em li serokekî digerin!  
-taban-  
Li tabanê xwe digerim!  
-serokek-  
Kes ji teraliyê nemiriye!  
-tembelek-  
Bijî hebûnîzm, bimre rûfîzm!  
-rûtek-



-Ger ez qahwê vexwim ez nikarim razêm.  
-È min jî, ger ez razêm ez nikarim qahwê vexwim!

Xaçepirs												
	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1	M	A	H	A	B	A	D	I	R	A	G	
2	R		R	A	K	E		K	A		A	
3	B	A	L	Ü	Z		D	D	K	D		
4	B	A	R	Z	A	N	I	P	E	R	I	
5	R	O			X		X	X	E	M		
6	G	A	S	I	M	L	O		D	E		
7	I	G		O	L	A	N		T	H		
8	D	E	R		A	N	S	O	R	E		
9	A	È	Z	Ì	D	I			M	M		
10	S	O	B	E	O	M	A	M	A	E		
11	E		N	A	V	I	S	R	D			
12	S	I	R	W	E		G	A	S	I	D	

Bersiva hejmara 7'an

### Çîna serdest û ya bindest

-De kanê bibêje, çîna serdest û çîna bindest ci ne?  
-Çîna serdest Çîna mezin e, çîna bindest jî Taîwan e!

MED TV

Med TV qasto televîzyona kurdî ye. Lî % 40'ê programên wê bi tirkî ne. Ger programên tirkî yên li dij dewleta tirkî mesajekê bide dewletê û gelê tirkî, temam e, jê re gotin nîne. Lî xwedê hebînî ew stranê tirkî yên di quncikan de mayî ewê ci feydeyekê bide tirkan û kurdan. Ger derdê me guhdarîkirina stranê tirkî be, Star, ATV, SHOW, Kanal D, TRT, TGRT û hîn bi sedan qanalê din hene. Ji kerema xwe dev ji wan stranê tirkî berdin. Her weha dev ji wan programên tirkî yên ku tu mesajekê nadin kurdan jî, berdin. Û li şûna wan cih bidin Dimili û Soranî qe nebe bêtir wê guhê me fêrî van lehçeyan bibe, her weha wê aksîkarîya nêzîkbûna lehçeyan jî bike.

### DÊYOL

Li Tirkîye di bin seroka-tya ANAP û DYP'ê de hukmateke nuh ava bû. Di programa wan de çareser-kirina pirsa kurdan jî heye; ewê dîsa wekî berê bikin, ligel gundê valane-bûyî icar ewê qeza û bajaren biçûk jî vala bikin. Kuştinê qesasnediyar jî ewê bikin quesasdiyar.

### PETROL

Wezirekî Bexdadê di Kurdistana Başûr re hat Kurdistana Bakur û di wir re jî çû Anqereyê bi bi gelek wezîr-meziîren Tirkan re rûnişt û nîv-biryarek girtine ku wê petrola Ker-kukê dîsa wekî berê ji Kurdistan Başûr bişin Kurdistan Bakur û di wir re jî bişin ser Deryaya Sipî. Malê kê ji kê digrin û didin kê? Ez nabêjim em wan borîyen ku petrolê di-herikînin bi hewa xin, lî wexta ku xelk li ser me û malê me biryaran didin, divê em jî hesabê xwe bikin. Èdî yêng ku diteqînin bila biteqînin. Yêng ku dixetimînin bila bixetimînin.

# Bi Kirdênda çorşmedê Madenî ya sohbetê -6-

Hydar Diljen

## Culêran

- Culêran kam ê?
- Eşqiyay bî.
- Pekî Culêran nameyê dewda ïnan bî, leqabê ïnan bî?
- Léqabê ïnan bî, eşqiyayê koyan bî, çete bî.
- Nê pêro merdimê pê pî?
- E, qerebalixî bî. Kewtê ra pê 70-80 merdim biyê.
- Nameyê eşîrda ïnan çîçî bî?
- Ez nêzana, Culêran ci rê vanê, herkes sinasnego. Hukmat pêro ïnan dimi di bî.
- Dewa ïnan kotî bî?
- Dewa ïnan? Qijan di vinderdê. Dima eskerî desti şîbî Kungi.
- Kungi nezdiyê Elezizî ya?
- Tekewler esto ya, Qirnos di, işte wija di Qijan di mendê.
- Tekewler, seredê doldê Hezarî di?
- E.

— To va “Culêran amebî dewi di keynekê biremnê, keynekeri zî Tirkî nêzanayê”. A mesela senî bî?

— Nê Culêran şiyê kom dewi nan werdê, çimê xo bi namûsdeş şarî ya bî. Irz duşmanî bî, pêze-vengî bî. Kom keyna rindi kerdê xo çim a, şewi eşte a dewi ser, a keyna berdê. Gula Şeroy berdi, Pemi berdi, Reşi berdi.

— Kamcî dewi ra?

— Gula Şeroy, Sariki ra, dewda Madenî ra; Pemi mahla qarşî ra, xalkeyna pêrdê min a. Reşi dewi ja ma ya zaten. Nê eşqiyay pîsî bî, namûsizî bî. Wina nêbiyayê kesî sînayê. Hukmat dim di bî. Verî kamî ki eşqiyey kerdê se, xo xelisna, vatê “o merd o”, nameyê ey vijjayê. Eyna namûsizey kerdê, şarî nêsinayê. Culêran ameybî dewda ma, bîbî veşanî, şibî keydê pêrdê min ki non bûrê; Pemi berda, vato “Xalkeyna İsmailî ya”. Amey wija, piyê min taqîb kerdê. Piyê min vatê “ez o verdê Biharî (Dolê Xezarî) di biya”. Piyê min nê-vinderdê, tim şew siba şiyê verdê Bahrî masey.

— Şima dolî rê vanê çîçî?

— Mâ vanê dol.

— Piyê min vatê “ez verdê Biharî di biya”, va “min rana dî sax sol di debançey eşti, amey”. Va “ça-kêtîdê min bin di debançey zey ze-yirî yo. Çakêtîdê min min ra dûrî yo.” Va eynan va teslim ol!” Va “min va teslim nêbena.” Va “ti kam ê?” Va “veng çinîyo.”

Eyna verî wina deneme kerdê (ceribnayê), hele terseno nêterse-no. Va “xebera min Culêran ra çinîya.” Va:

— Teslim ol! (Teslim bi!)

Min va:

— Şima komî yê se veng bikerê, ez ci rê teslim ba?

Va “min xo est çakêtîdê xo heti û

debança ant”. Va “ê wija ra atêş kenê, tiya ra atêş kenê; ama dox-rî min nêerzenê. Berzê min min erzenê”. Va “ez xo kena wija, wija ra kenê teq; ez kena tiya tiya ra vanê teq.” Va “min va anani awradini sî.....”

— Dimilî senî vano?

“Mar û cenerda şima naye, kom ê, veng bikerê, Min rê torinê Kelalî vanê, min ceniya komî remnaya?” O nêtersayê. Qetîyan ters û diye nêzanayê, şew-siba. Üfaq tefek, zayıf û qawgacî bî, nêtersayê. Va min dî va “ez Xalîte Culêran a.” “Ateş kesmiş kerdî (birnay). Min va “xeyr o, çîçî yo” Ondan sonra ver a min amey va “ti mîra yê. Ti yîgit ê. Ti bê a ma kû, ma ra biceyri” (bigeyri). Min va “ez kermê jê ûcaxî ya, ez şima ya nêgeyrena.”

— Va ez çîçî ya?

— Kermê jê ûcaxî ya, yanê însanê jê ûcaxî ya.

— Yanê ez keyeyên di jew merdim a, zewbî birayê min çinî yê?

— E, ez tek merdim a.

Ey dima begenmiş kerdô.

Neyse, biyê veşanî, ameyê keydê pêrdê min ki non bûrê. Na ra Reşi û Berfik a wija nerdîwani ser o nişte ro, xo rê pûç (pûçikî, gérwey) virazenê. Gogeçî-mogecî dézan anê roşenê, eynan ra “gel, gêt” müsayê.

— Gogeçî, yanê çerçî?

— Yanê ê ki dézan anê roşenê. Şima dêzey nêdiyê? Verî tim ardê rotê. Sursurî ra ardê rotê.

— Sursurî dewa Madenî ya?

— Nê, nê. Kişa Xarpêtî ra ya. Dêzey wija viraşte. Herri ra vi-raşte, qewirmış kerdê zeydê tux-la. Verî tencirey çinêbî. Verî tikê baqir çêdê (kêdê) kesî di ki bî, vatê û... Şarî xo rê dêzey-mêzey girotê, tey çi pewtê. Ê ki dêzey ardê rotê, Tirkî bî. Cenî, keynekê `ezebî şiyê dézan mîzan bigirê, “gel, gêt” müsayê.

## Aşaxîkî degîl yoxarîkî

Va “ma xo rê wija pûç virazenim. Ez cor di nişta ro, Berfiki min ver o.” Va “ma dî amey, sîleh milan a, şinê keydê Kelalî, keydê pêrdê min.” Va “şinê keydê Kelalî, ceyray nata ma.” Va “min dî ey jewî va” aşaxîkî degîl, yoxarîkî” û şî zerre. “Yoxarîkî”, ez a. Va min va Berfî, to dî va “aşaxîkî degîl, yoxarîkî.” Berfiki va “çî winî va?” Aşaxî, min rê va.” Va min va nê, yoxarî min rê va.”

— Qey Berfiki zî waştê ay berê?

— Ey ci zona, qey.

— Wexto ki jû şino keynekê wazeno, kîfî ïnan weş beno. Vana qey ez rind a, min wazene, to nê-wazene.

— Ey qey winî vato. Vato “la min rê va ha.” Va “yoxarîkî, yo-

# Ferhengekê Kirdkî-Pehlewki-Kurmanckî -XIII

Malmîsanij

## Kirdkî (Zazakî)

Orim (Orrim), Rûm  
Orimî  
orispi  
orispiyey, orispêni

P  
pa  
pabeste, piyabeste  
pabestiş, piyabestiş  
pabestiyayış  
padişah, padişa  
padişahî, padişayey  
pahn, pa'n  
pahnî, pa'nî, pa'ney  
pak, pank  
pakî, pakîye, pakêni  
panc  
pancés  
pancésin  
pancsey, pansey  
par  
pardax kerdîş  
parêz  
paşna, başneki  
pawutene, pawitiş  
pawenawox, pawitox  
payîz  
pejmîriyayış  
peme  
pemeyin, pemeyen  
penîr  
perçin  
perde  
perey  
pergende kerdîş  
peri  
perr, perrik, pel  
perrayış, firräyış  
pers, persayış  
persayine, persayış  
pes  
peskofi  
peşm  
peşmîn, peşmîn  
pey, bi, ebe  
pey  
pey  
peyda  
peyen, peyin, peynî  
pêmitene, peymawitiş  
peykanî

## Pehlevkî (1)

Hrom, Romîk  
Hromayîk, Hromîk  
rûspîk, rospîk  
rûspîkîh, rospîkîh

P  
pad, pay, zeng  
petvestek, peîvestek  
petvesten  
petvesten  
patixşah, patixşay, patexşa  
patixşahî  
pehnay, pehen  
pehnay, pehnad, pehna  
pak, pakîzek  
pakîh, pakîzekîh  
penc, penç  
panzdeh  
panzdehom  
pencset  
par (2)  
perdaxten  
pehrêç, pehrêxtakî  
pehrêxtar  
paşnek  
paten, payîten, patûten  
pan, ban, pânek  
patêz  
mariş, oşmuriş, uşmuriş  
pembek  
pembekên  
penîr  
perçin  
perde  
perêr  
pergenden  
perîk, perîy (3)  
perr, perrek, perîk  
perîten, fravayış  
pursiş  
pursîten  
pesê, pesuş, pesvîk  
paçen, pazen  
peşm  
peşmîn  
pat  
pad, pay, pey  
pes  
peitak, pêtak  
pesen  
petmûten  
epaçkun

## Kurmanckî

Rûm, Romî  
Romî, Rûmî  
orispi  
orispi

P  
pê  
pêvegerêdayî  
pêve girêdan  
pêve hatingirêdan  
padişah, padişa  
padişahî  
pehn, pan  
pehnî, panî  
pak, paqîj  
pakî, paqîjî  
pênc  
panzdeh  
panzdehemîn  
pêncsed, pênsed  
par  
perdax kirin, temam kirin  
parêz  
parêzkar, kesê ku xwe ji tîsteki diparêze  
pajne, pehnî, panî  
pan, payîn  
kesê ku dipê, kesê ku diparêze  
payîz  
fikirîn  
penbû  
penbûyîn, penbûyî  
pêner  
perçin, dîwar  
perde  
pêr  
pergende kirin, belav kirin  
perî  
perr, pel  
firrîn  
pirs  
pirsîn  
pez  
pezkûvî  
peşm  
peşmîn, peşmî  
bi  
pey, piş  
paşê, pişti, di pey de  
peyda  
paşîn, dawîn  
pîvan, peyîvtin  
berpaş, vajî, bervajî

(1) Kelimeyê Pehlewkiyê ki tiya di nusiyayê, mi nî kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlevî

(2) Pehlewki di “par” yeno me’na “demey viyartû, wextê viyartî”.

(3) Pehlewki di “perik û perîy” yenê me’na dêwa mayki (dêwa make).

Şinê keydê Xal Mistoy, vanê “kalo, aşaxî cor o, yoxarî cor o?” Kalî vato “çîçî?” Vato “aşaxî cor o, yoxarî cor o?” Berfiki vato “nê, yoxarî cêr o.” Reşi vato va “yoxarî” cor o, ez cor di nişta ro. Eger to rê bivatê, vatê “aşaxî.” Ay vato, “aşaxî” işte cor o. Diha behs kerdô, vato “hadirê ma şirê çêdê Kal Mistoy.” Kal Misto dede ci biyo.

— Ci rê nê eşqiyayan Tirkî vatê. Ma nê Tirkî bî?

— Nê, Tirkî nêbî. Winî kerdê ki keyney nêzanê. Eşqiyay Zazay bî.

Sinê keydê Xal Mistoy, vanê “kalo, aşaxî cor o, yoxarî cor o?” Kalî vato “çîçî?” Vato “aşaxî cor o, yoxarî cor o?” Tirkî ney rê se vanê? Kalî vato “Oxit oxil, aşaxî tiya cêr di nişenê ro, yoxarî cor di nişenê ro.” Reşi vato “tu, ez cor di nêbiya.”

— Yanê Reşi qezenc kerdô?

— E. Reşi zaf xaseki bî. Berfiki riyye xo rind bî. Reşi, tewûûn! Cayo ki Reşi vindero Berfiki rê non çinîyo. Berfiki rê nêvato, Reşi rê vato.

— Berfiki nika çend serrê ya?

Berfiki merda.

— Ki weş bibiyayê, do nika çend serê biyayê?

— A zî zey Reşa bî

— Yanê çend serrê?

— Reşi neway qedînayo.

— Neway serrê bî û nameyê ci Berfiki bî? Nika kes hend nama-nê ze Reşi û Berfiki pa nênano.

— Berfiki û Hewiki wayê jûbînî yê. Nûrî û Berfik a jê pîze biyê. Jê lajek, jê çenek.

Dewamê ci esto

## Efsaneda Newrozi ra Ders Girotış

Haydar DILJEN

**M**a yê Newroza emserî zî dî şertandê xeylê giranan di pîroz kenê. Dewleti, şewateyo ki 75 serrî ra ver verdabi welatê ma ya, her ki şî gurr kerd û bi operasyonandê newan a, bi veşnayışdê dewan a, bi zor a macîrkerdişdê bi milyonan Kurdan a, bi serecikerdişdê gerilan a, bi zor a korucikerdişdê Kurdan a no şewat o ewro hewna zî gûrrê beno.

Na polîtikaya dewleti a ya parêda gird a butçeda Tirkîye bena. Ecrê na polîтика, hem Kurdî û hem zî Tirkê feqîr fiqarey ê yê ancenê. Çimkî no siyaset, biyo sebebê békarey, vayey, veysaney û feqîrey.

Seserra vîstine rê çar serrî mendê, labirê na dewlete hewna heqê Kurdan ê insaney û millî qebûl nêkerd ê. Hewna di mektebandê dewleti di û ê xisûsiyan di bi ziwandê Kurdkî wendîş yasax o. Di televizyon di muzîkê Kurdan yasax o. Pêrini ra muhîmîr zî hewna identîteyê Kurdan niyameyo qebûlkerdiş. Di protokoldê hukmatdê newî (hukmatê ANAP û DYP) di zî meselada Kurdistanî ser o satîre cîniya. No hukmato newe zî mesela Kurdistanî ze mesela "teror"î vîneno. Bi kilmey a hewna "ê ki Tirkîye di ciwêne pîro Tirk ê".

Partî û grûbanê siyasiyanê bînan û bôlkîya rewşenbîranê Kurdan ê ki teberdê PKK dir ê; nê 16 serrandê peynîyan di, bi awayo ki eynan ra ameyê waştîş, wezîfeyê xo nêkerd. Co ra pratîk di dawa Kurdan biya ze dawayêda mabêndê PKK û dewleti.

**S**emedê wezîfanê xo bicaniyârdîşê partî û grûbandê bînan zaf ê. Labirê goreyê fikirdê min semedo muhîm, hedefê werdi xo ver nayîş û kar û girweyê xo û heyatê kadro û rîberandê xo goreyê nê hedefandê zaf werdiyan organîzekerdiş o. Na polîtika bî sebeb ki xeylê kadroy û rîberê grûb û partiyandê bînan giraneyda bardê dawa Kurdistanî bin di pelixiyây û pratîk di meydandê mucadeli ra vîjîyay. Ki şima xo çosme ra biewniyê, şima do bi seyan a kesanê winasiyan bivînê. Kesê wina yê ki "devî ra kewtê labirê hewna hophopda xo ra nêkewtê". Yanê ti çend vojê grûb ya zî partiyê xo kerdê werdi; hetta taynan fek grûb, partî û embazandê xo ra zî verdayo, labirê fek qisanê xo yê gîrden û vengan ra nêverdayo. Hewna zî na mesela weş fam nêbiya. Heta ki na mesela weş fam nêbo, çend grûbî ya zî partî û bi namedê çicî ya beno wa bîbo, bêrê pê heti û piya jew bê zî ci ra çiyê nêvîjêno. Ki hedefê to perrayîş (firrayîş) bo, gerek ti teyera û pîlotî ya peyda kerê. Nê, ki ti traktor û şoferi ya, hetta ga û citîri ya peyda kerê, o yeno o mane ki to ne virnayışdê dînyay ra, ne zî ê welatdê xo ra çiyê fam kerdo. Demewo ki şar o bi satelîtan a alaqedar beno ti yê hewna bi tamîrkerdişdê qereba-fûni ya xo xapênenê.

Pekî qandê ki kes efsaneya Newrozi ra dersi bigiro, yanê dosî bido pê, mucadele bikero û bi ser kewo, gerek kes se kero?

a. Verê heme çi; partî, grûbî, kadroyê siyâsî yê xoser û rewşenbîrê ki teberdê PKK dir ê û nêwazanê dekewê binê tesîrdê PKK, labirê wazanê siyaset bikerê, gerek kilawa xo xo ver di ronê û dirûmdê siyâsî yê Kurdistanî û weziyetdê xo ser o xorî xorî bifikiriyê û xo newe ra organîze bikerê. Ê ki şenê piya partiyê di bigirweyê wa bigirweyê, ê ki nêşenê piya partiyê di bigirweyê wa xo rî partîna virazê û bi ê bînan a dostey û ittifaq bikerê. Tabî, ne ki tenya bîbî jew ya zî partî virazê, gerek çiyo ki vanê bi ca biyarê. Ki bi ca niyarê fina beno zey verî.

b. PKK miyan di grûbê Kurandê bînan rî û Kurandê bînan miyan di zî grûbê PKK rî dişmeney kena. Mentiqê nê wirna kiştan zî zey pê yo û wirna kiştî zî zirar danê meselada Kurdan ro. Nê wirna grûban ra tayn, iflah nêbenê û gerek nê bêrê izole û teşîrkerdiş. Tayn Kurdê ki dewlete zafêrî dişmeneya PKK kenê û tayn PKK'iyîê ki dişmeneya tayn Kurandê bînan kenê, wa rind bîzanê, ki wazanê welatperwer bîmanê ganî (gerek) xo xeyalandê pawitişdê qediyâşdê pê ra fek veradê. Ki fek nêveradê, ê xeyalî do eyna berê cayêdo zaf xirab.

Ganî (gerek) heme Kurdê welatperwerî iqnâ bê ki mesela Kurdistanî ne bê PKK hel bîna ne zî bê Kurandê bînan.

c. Heme partiyê Kurdan, rewşenbîrê Kurdan, PKK û dezgehê bînî yê Kurdan vera dişmenî mecbûr ê ki piya ittifaq bikerê. Ki wina nêbo, ewro PKK û meşti zî belkî partiyê bînî çend quwetin benê wa bîbê, serkewtîş ya zî qedî dewleti û partiyandê ci biyayîş mumkun niyo. Ma pêrini hem teber di û hem zî zere di tesîrê ittifaqdê weçinayışdê (seçimê) 24'dê mengda 12'î ya serrda 1995'i di. Nê weçinayışi hem moralê şarê ma weş kerd û hem zî dawa Kurdan vêşerî mhesrû kerdî. Ma gahî nê ittifaqî ra ders bigîrê.

Ez hêvî kena ki di Newrozdê 96'i di, pîro Kurdê welatperwerî, na raştey di mezg û zerrîda xo di bi ca bikerê. Ki wina bo, ma do efsaneda Kaway ra ders bigîrê û îqîtidarê Dehakandê evroyênan orte ra wedarê û erdê bawik û kalikandê xo ser o çareakerde bigeyrê. Ki wina nêbo, ma do hewna zaf heqandê xo pêrinan ra bêpare bê û lin-gandê şarî bin di bîmanê. Bi hêviya ki ma layiqê qehremaneyda Kaway û şardê Medya bê, wa Newroza şima pîroz bo!



## Newroza şima pîroz bo!

**E**mser jî Kurdî heme cadê dînyay di roşanê xwi yê neteweyî bi şâhey a pîroz kenê. Labelê mileta ma Kurdistanê Vakurî di emser jî Newrozi zilm û tahda bin di ravêrnena. Herçendi ki dewleti Newrozi kerda rojênda resmî jî, a nêverdana ki

Kurdî Newroza xwi zey xwi pîroz bikerê. Gorey ïnan Newrozi roşanê Tîrkan o veren o. Bi hêviya ki ma Newroza xwi gorey xwi û we-latdê xwi di bê ters û bê zilm pîroz bikerê, wa Newroza şima pîroz bo!



### Hukmato newe viraziya

## Pêlekî ïnan di Kurdî cîniyê

**R**ojê 3.3.1996 di serekê ANAP Mesut Yılmaz û serekê DYP Tansu Çilleri ïlan kerdî ki ïnan qandê hukmatê newî pê kerd o. Bi viraziyâşê hukmatî Tîrkiye krîzî hukmatî ra reyê. Labelê û do mesela Kurdan ra senî bireyê, no xusus di cî-

yondê newe pêlekî ïnan di cîniyo.

Protokoldê hurdina partîyan ê qandê hukmatê newî di behsê Kurdan cîniyo, labelê mesela terorî esta û ê vanê ma do hewna bi şiddet şîrê terorî ser di. Helbet teroro ki ê behs kenê mesela Kurdan a.

## Cayê "faîlî mechûlan" vinîbiyayey gînê

**N**o çend serrî bi ki Kurdistan di pêla cînayeta-nê "faîlî mechûlan" berz bîbi û roj cînêbi ki Kurdê welatperwerî bi destê "kesanê nêşinasnaye-yan" nêrê kiştene.

No demên o ki no uslûb ameyo virnayış û no fin xeylê kesi yenê tepiştene û polîs an jî eskerî va-

nê "ma ê netepiştê". Namê nê kesan jî "kaybolanlar", yanê "vinîbiyayey" ê.

-Gorey rapora Komeleya Heqê Merdiman a Di-yarbekirî, 1991 ra nata kesê yinîbiyayey ê ki namayê ïnan resayê Komela 200 kesan vêşerî yê.

## Operasyonê Wesarî

Dewleta Tîrkiye, bi ameyîşê wesarî dest bi operasyonanê newan kerd. Nê operasyonan di xeylê dewê qezayanê Sêwasî bi semedê ki ardimê

terorîstan kenê, amey vengkerdene. Labelê çiyo balkêş o yo ki nê dewê ki ameyê vengkerde û dewê Elewîyanê Kurdan ê.